

## Komîteya navdewletî

Li Kurdistanê jîn, fêmkirina rastiya şer û li hember wê asoyên lêhûrbûna xwekûrkirinê ye. Jinên kurd ên ku ruxmî rê û rêbazên êrîşên qirkirin û komkujiyan, dikaribûn hebûna xwe di çareseriya pirsgirêkên bingehîn ên civakê... **Sorgul Şêxo /R.2**



## Gefên Tirkiyeyê û Ewropa

Tirkiye bi hewildanên xwe yên provokatîf li Rojhilata Navîn bi qasî ku pêşî li pevçûn û provokasyonan vedike, her ew qas jî pêşî li aştiya herêmê digire. Rejîma AKP-MHP'ê bi liv û tevgera xwe ya li Derya Spî dixwaze heman polîtîkayê... **Felemez Ulug /R.6**



## Çîroka bûka bedew

Min heta niha di vî emrê xwe de bûkeke wisa bedew neditiye, bê merûmê hema xwedê qelema xwe li ser te xêz kiriye gelo? Lê dayê, meriv ewqas jî bedew nabeee! Wan deman ez hê jî teze dibûm qîzeke xama. Lê hemû derd û kulên min bi dît... ***Kewê Redkan /R.10***


# xwebûn

1-7 Sibat 2021 HEJMAR: 59 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


## Ruhê yekitiya neteweyî

Netewebûn û yekitî du tiştên di nav hev de ne, ango her du hev du dihewînin. Heke em qala netewebûna neteweyekê bikin, wê demê pirsgirêka wê neteweyê ya yekitiyê tune ye. Bi kurt û kurmancî heke li devera netewebûn hebe, yekitî jî heye. Li devera netewebûn nebe yekitî jî tune ye. Netewebûna kurdan wê bi xwe re deskeftiyên mezin bîne ku me bi serê çavên xwe di dema berxwedana Kobanê de dît. Dibe ku cara ewil e di dîroka Kurdistanê de hemû kurdan mil da hev ji bo xwe şer kirin. Bakur û Başûr mil dan hev û barbarên sedsala 21'ê tevî... ***Hisên Çatikkaş / R.8***

## Mirov an melekên xirab?

Di qewl û felsefeya êzî de, qencî û xirabî ji yek navendê tên. Xwedê bê şirîk û heval e. Mirov ji axê çêbûne, wê bibin ax. Mirov nabin şirîkê Xwedê. Dinya milkê Xwedê ye. Ezazîl berî mirovan hebû, Xwedê berê ji durê gerdûn, Adem û hemû xulyaqet afirandine. Adem ji axê çêbûye û pêwîst bû bibe ax. Derketina wî ya ji bihuştê pêwîstiyek bû. Helbet ji surê, nûrê, yan ji stêrkan xuliqiye û berê dinya hemî av bûye. Teoriya "Big Bang"ê jî hema nêzîkî heman babetê ye. Ezazîl erka xwe pêk anî, ji axê Adem afirand û ruh berda bedena wî, bi dengê muzîkê, di qewlê êzî de... ***Newaf Mîro /R.8***

## Romana 'Sor' û 'Mor' û Hêvî

Rênas Jiyan teknîkeke nivîsandinê ya nû ceribandiye. Li gorî vê teknîkê armanca nivîsa xwe serkeftî gihandiye encamê. Nivîskar di romanê de sê rêbaz bi kar anîne. Beşek weke parçeyên niviştê, yek weke kes/ên li dû niviştê digerin, beşek jî ji rojnivîsk û êşa xwendekarekî ku ji mirina eta (abla) xwe aciziya wijdanê dikişîne pêk tê. Serê pêşîn ez rexneyên xwe derpêş bikim. Bi min nivîskar çend beşên di serê romanê de bi xwe yekser ketiye nav mijaran û bi nirxandinên zêde mudaxaleyî romanê kiriye...
**Yaşar Eroglu / R.5**

# Parastina mal û warê me

"Me, mala xwe li ser riya xelqê ava kiriye. Her kî tê bi malovaniya me têr nabe û çav berî mal û milkê me dide." Belê kurtenivîsa dîroka me, hema ev e. Xwezî tenê ev bûya. Wêraniya herî giran hebûna qîra reş e. Petrola bêbinî, zengîn, kalîteya xas û derxistina hêsa, li welatê me bû bela serê me. Li welatê dereke, şêniyên ji me dûr pîşesaziya xwe bi pêş xistin, lê enerjiya wan li ba me ye. Bivê nevê çav berî herêma me dan. Bi vî halî, sed hezar heyf e, ku her kes li welatê me xwedî derdikeve û xêncî me. Belê divê em hişyar bin, ji xewa mirinê rabin, bi berxwedêran re hevalbend bin... ***Ehmed Pelda / R.7***



*Li Êlihê bi sedan kes meşiyan*

*Parlamenterên HDP'ê û berpirsên KCD, TJA, DBP'ê bi tevlîbûna gel, ji bo pêkanîna yekitiya neteweyî 29'ê sibatê li Êlihê xwestin daxuyanî bidin çapemeniyê. Polîsan girse dorpêç kir û nehişt daxuyanî bê xwendin. Li ser vê yekê, gel bi biryardarî û dirûşmên 'Bimire xiyanet', 'Bijî berxwedan zindanan' meşiya. Polîsan bi ava şid, gaza îsotê û jopan êrîşî gel kir. Piştî êrîşê endamên Meclisa Dayikên Aştiyê jî di nav de, gelek kes hatin binçavkirin.*

# Nêzîkatiya CPT'ê tecrîdê girantir dike



Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê (CPT) hefteya borî serdana Tirkiyeyê kir lê ligel tecrîda giran a li ser Ocalan neçû Îmraliyê. Parêzera Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Newroz Uysal der barê serdana CPT'ê de axivî û wiha got: "Divê CPT encamên vê pêvajoyê ji konseyê û ji Dadgeha Mafê Mirovan a Ewropayê ya endama konseyê re ragihîne. Hemû dewletên endam ji vê yekê berpirs in. Li ser raporên komîteyê di heman demê de li Meclisa Konseya Ewropayê jî hevdîtin..." ***R.7***

## Ji malbatan banga bibin deng

Greva girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê ya 27'ê Mijdara 2020'an dest pê kir di meha sêyemîn de didome. Dayika Mehmet Bînîcî û Îbrahîm Bînîcî yên girtî Emîne Bînîcî bang kir ku daxwazên girtiyan bi cih bînin. Bînîcî diyar kir ku ji 10 zarokên wê 9 jê di demên cuda de hatin girtin. Bînîcî anî ziman ku ji xeynî 2 zarokên wê... ***R.3***

## Çîroka Çemê Çetelê

Çend roj berê, di TV'yeke tirkan a beşa kurdî de strana Elî Xwarzê hate weşandin û wekî ku haya wan ji vê dîrokê tune be kê û ji bo çi û çawa ev stran derketiye holê. Li ser vê rewşê min jî xwest ez bi xwendevanên hêja re kurteçîroka stranê binivîsim û ji bo kesên têkildar jî gotin û notayên her du şêweyên stranê pêşkêş bikim. Piştî qetilkirina 14-15 hezar kurdan li Geliyê Zîlan û têkbirina serhildana Agiriyê, dewleta Romê weke serhildana Şêx Seîd, ferman û sirgûna serkêşên kurdan derdixîne... ***Veysî Varli /R.11***



## Deyndarê zimanê xwe me

Mêvanê rojnameya me yê vê hefteyê nivîskar û weşanger Qahir Bateyî ye. Bateyî wiha got: "Mixabin her diçe, zimanê kurdî di nav civakê de dihele, ber bi..." ***Hevpeyvîna Rizoyê Xerzî /R.4***

## Şengalî dixwazin bên naskirin

Tê zanîn ku di 18'ê çileyê de Wezîrê Parastinê yê Tirkiyeyê bi şandeyekê serdana Bexda û Hewlerê kiribû û der barê dagirkirina Şengalê de daxwazên xwe hem bi Bexda û hem jî bi rêveberiya Hewlêrê re parve kiribûn. Piştî gefên Tirkiyeyê yên li ser Şengalê, şandeyek ji Rêveberiya Xweser a Şengalê serdana Bexdayê kir. Şandeya ku ji nûnerê PADÊ, TAJÊ, Desteya Êsayîrî ya Şengalê û Meclisa Rêveberiya Şengalê pêk hatî, li Bexdayê hevdîtin kirin. Şandeyê herî dawî bi serokwezîrê Iraqê yê berê Heyder Îbadî, cîgirê sefîrê Misrê û yê Rûsyayê re civiya. Şandeya Şengalê piştî hevdîtinan bi daxwaznameyekê daxwazên xelkê Şengalê pêşkêşî berpirsên Iraq, Misir û Rûsyayê kir û xwest peymana li ser Şengalê were betalkirin... ***R.6***



## Ji bo jinên siûdî kursên ajokariyê

Di sala 2018'an de jinên Erebistana Siûdî mafê ajotina wesayîtan bi dest xistin. Bi salan e li vê deverê ji bo jinan bikaranîna wesayîtan qedexe bû. Di salên 1990'an de ew jinên ku dixwestin wesayîtan bajon li ser dîreksiyonê dihatin girtin. Di sala 2010'an de jî wan jinên ku dîmenên xwe yên li ser dîreksiyonê diweşandin bi sûcdariya îxanetê ceza li wan dihat birîn. Yên ku ev yek diparastin jî bi gefên mirinê re rû bi rû diman. Piştî rabûna qedexeya ajotina seyareyê, bi hezaran jinên siûdî ji bo ehliyeta ajokariyê bigirin serlêdan kirin. Ji ber kursa ajokariyê maliyetek zêde dixwaze, jin berxwedanê dikin û hinek wan jinan dest bi dayîna kursa ajokariyê ya bê pere kirin. ***RIYAD***



## Stargeha jinên Megribê Dara Aman

Li bajarê Megribê ya Yemenê stargeheke di 9'ê tîrmeha 2020'an de ji hêla Weqfa Enf a Parastina Mafê Mirovan a Yemenê ve hatiye vekirin. Vekirina stargehê ji bo jinên ku ji tundiyê rizgar bûne gaveke guncav e. Di stargehê de 14 jinên ku rastî tundiyê hatine, dimîne. Armanca Dara Aman ango mala ewlehiyê, piştgirîdayîn û parastina jinan e. Ji rêveberiya saziyê Heyfî El-Ehmsî têkildarî xebatên diyar kir ku ji bo jiholêrakirina bandora tundiyê ya li ser jinan û tevlikirina nav civakê pêdivî stargeheke bi vî rengî dîtine û wiha got: "Ji aliyê din ve di stargehê de ji bo jin karibin xwe bi rêve bibin ango bibin xwedî biryar perwerdeya hişmendiyê tê dayîn." ***SANA***

# Ji bo cihên hatine dagirkirin Komîteyeke Navdewletî divê



Sorgul Şêxo

Li Kurdistanê jiyîn, fêmkirina rastiya şer û li hember wê asoyên lêhûrbûna xwe kûrkirin e. Jinên kurd ên ku ruxmî rê û rêbazên êrîşên qirkirin û komkujiyan, dikarîbûn hebûna xwe di çareseriya pirsgirêkên bingehîn ên civakê de, diyar bikin. Di heman wextê de hêza xwe ya çareseriya krîzan û nasnameya xwe ya siyasî, ruxmî çewesîn û polîtîkayên tunekirinê, dikarîbûn derbixe holê û bibe hêza guhertin û veguhertinên bingehîn. Şerê ku di sedsala 21'an de li bermaberî jinan tê kirin, bêgûman planeke demdirêj, kûr û dirêj e. Eger dar ne berhemdar be rastî keviran nayê, jin jî eger ne bi hêz û bi bandor be, rastî êrîşan jî nayê. Êrîşên ku li hember jinên kurd li Kurdistanê tên kirin, asta bandora wan li ser hişmendiya dewletê û tirsa faşîzmê ji wan, zelal dike. Warê zeytûnan bi berxwedana Silava, Bêrîvan û Jîndayan ji çeteyan hat paqijkirin, bedewbûn û dîroka wê hat parastin. Rizgarkirina her buhistek ji warê zeytûnan, bi sedan ji çîrok, destan û efsaneyên dîrokê lê hatine nivîsandin. Her buhistek ji axa Kurdistanê, çîrokên berxwedanê lê hatine vegotin. Însanên ku nebin çav, guh û zimanê şoreşa ku eynika bi milyonên mirovên bedew û şervan û lehengên azadiyê ne, gunehkar in.

Dema ku li Kurdistanê qala jinan tê kirin yekser şoreş, berxwedanî, lehengî û fedekariya wan tê bîra mirov. Pêşengên şoreşên ku pêk tên, her dem jin in, hêza ku herî zêde jî dijmin jê ditirse dîsa jin in. Di berxwedana şervanên YPJ'ê li hember çeteyên DAIŞ'ê de, gotina çeteyên ku ji aliyê şervanan ve dihatin dîlgirtin ev bû: "Eger em bi destê jinek ango şervaneke kurd bên qetilkirin em naçin bûhiştê". Lê herî dawî jî xîlafeta wan bi destê şervanên jin hat hilweşandin. Nirxandinên çeteyan a li hember jinên kurd, asta hovîtiya wan vedigot. Şervanên YPJ'ê tola jinên êzidî û yên herêmê jî ji çeteyên ku ew jin di zeytê de diqelandin, bi şûr serjêkirin, bi penseyan neynûkên wan radikirin û bi vemirandina çixareyan di laşê wan de, di zindanan de bê xwarin û vexwarin dihiştin, bi rizgarkirina Reqqayê re, hilan. Lê dewleta tirk tehmûlî vê yekê nekir û bi rengekî aşkera, êrîşî destkeftiyên Şoreşa Rojavayê Kurdistanê ango şoreşa jinan kir. Ji 2018'an heya niha êrîşên dewleta tirk li ser dergûşa şaristaniya mirovahiyê û welatê agir û rojê, qet ranewestiyaye. Li hember vê êrîşê gulîmorên welêt di her kêliyê de ji bo afirandina jiyaneke azad û bi rûmet, di nava têkoşînê de bûn.

Min yekem car piştî Berxwedana Sedsalê ya Kobanê di sala 2014'an de, di Berxwedana Serdemê a herêma Efrînê de li hember hêza duyemîn a NATO'yê, dît ku efrînî gelekî berxwedêr û parêzvanên nasnameya, dîrok û hebûna xwe ne. Berxwedaniya 58 rojan ne jî rêzê ye, di her kêliyekê de berxwedaniyeke ku di vegotina wê de ziman pûç dibe, hatiye nivîsandin. Li her bûhisteke axa Efrînê xwîna lehingekê/î hatiye rijandin. Li bin her darek zeytûnê, li ber her zinarekî û li ser her çiyayekî û girekî Efrînê, bi dehan serpêhatiyên şervan û jinên berxwedêr hene. Xwezî zimanê wan dar, zinar û çiyayan heba ku ew çîrokên berxwedanê, hêvî û têkoşîna şervanan vegota. Gelê Efrînê derveyî yên ku koçî herêma Şehbayê bûn, jinên ku li hundirê Efrînê jî man, li ber xwe dan. Jinên ku dixwestin bi hebûna xwe ji dagirkiran re xuya bikin ku çiqasî xwedî li ax û nirxên xwe derdikevin, rastî gelek kiryaran hatin. Ji dema dagirkirina Efrînê heya niha dîmenên jinan ên di zindanan de, li ber daran hatine qetilkirin û yên ku rastî tundiyê hatine, tê xuyakirin. Jinên ku di serdema 21'an de di sîstema hevserokatiyê de roleke aktîf lîst û dikarîbûn hişmendiya civakê ya li hemberî xwe bide guhertin, niha bi gelek kiryaran re rû bi rû ne. Jinên ku xwe bi azadiyê xemilandibûn, niha bi agirê dojeha dewleta tirk re rû bi rû ne.



Demê ku mirov dibêje DAIŞ neviya dewleta tirk e, ji valahiyekê nayê. Nav û cil tên guhertin lê hişmendî û armanc heman tişt in. Çawa ku di tebaxa 2014'an de çeteyên DAIŞ êrîşî jinên êzidî kirin û bi hezaran ji wan di bazarên Mûsil, Reqa û Şedadê de firotin, niha dewleta tirk jinên efrînî jî dişînin Lîbyayê. Şandina jinan sûcekî pir mezin e û pêwîst e li hember wê, bêdengî nebe. Di cotmeha 2020'î û çileya 2021'an de NY'yê daxuyanî dan û anîn ziman ku dewleta tirk li dijî jinên Efrînê kiryaran pêk tîne. Lê li ser rûyê erdê tu gavên şênber wekî, komîteyeke navdewletî ava bikin û derbasî herêmên dagirkirî yên wekî Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî bibin û rewşa jinan ji nêz ve bişopînin û kiryarên derheqê wan de li ser zemîn belge bikin, tune ye. Derveyî ku dewleta tirk hemû zagonên navdewletî bin pê kir û derbasî xaka Sûriyeyê bû û şêniyên wê yên resen neçarî koçberiyê kir, niha jinên wê jî direvîne. Birîna Şengalê li Efrînê nû dibe lê cîhana ku xwe wekî kor, lal û ker nîşan dide, hêzê dide dagirkeran ku hînbêtir sûcan pêk bînin û di heman wextê de jî sûcdaran baş diparêze.

Jinên kurd ku rêhevala çekê ye, cêwiya giyanê û kaniya zanistê ye, îro rastî hovetîrîn kiryarên ku wijdanê mirovahiyê ranake, tê. Ji bo jinên kurd sedsala 21'an sedsaleke girîng e ku têde bikaribin nasnameya xwe ya siyasî, dîplomatîk û aborî bidest bixin. Di heman demê de sedsaleke ku li hemberî jinan jî şerekî gerdûnî hatiye destpêkirin e. Efrîna ku ji sancên wê Silava, Bêrîvan, Barîn û Avêstayan derketin, bi rêxistinbûyîn û berxwedana xwe, jiyaneke birûmet afirandin. Da ku ew jinên ku xwe bi azadiyê xemilandin neyên qetilkirin û tola jinên ku hatine qetilkirin were rakirin, pêwîst e ji aliyê civaka navdewletî ve Komîteyeke Navdewletî were avakirin û derbasî herêmên dagirkirî bibin û kiryarên derheqê jinan de tên kirin belge bikin. Di heman demê de pêwîstî pê heye ku dadgeheke navdewletî, li ser kiryar û komkujiyên ku dewleta tirk a dagirker derheqê jin û sivîlên herêmên dagirkirî her wiha li herêmên din ên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk anîne, were avakirin.

# Bi dara tewiyê zarokan ji nezerê diparêze


Ji bo parastina mal û can li her herêmê sîmgeyên cuda tên bikaranîn. Yek ji wan simgeyan jî dara tewî ye. Ev dar li gelek herêmên çiyayî hene. Piranî li warê lîlozan, li zozanên bilind ên Zagrosan ku befir jê naqede tê dîtin. Her herêmek a kevanên Zagrosan li gorî xwe navek lêkiriye û bi şêweyekê pê bawerkirine. Li herêma goyan ew dara tawiyê ye, li Cizîra Botan û Amedê tihok, li Serhedê tiew, li Wanê sinc û bi zaravayê soranî tayla e. Fêkiyên wê dişibe guhîjan hinek din biçuk û bi tehm in. Li hinek deveran jî ji fêkiyên wê şîranî çêdikin. Ji fêkiyan zêdetir bi pîroziya xwe tê zanîn. Li bajarê Sîne ya rojhilatê Kurdistanê bi navê wê goristanek heye û piranî li ser goristanan ev dar tê çandin. Li heman herêmê çiqên wê jêdikin parçe parçe dikin, bi ta ve dikin û weke tizbiyan bi mebesta parastinê bi dergûşa zarokan ve dikin. Hinek caran jî ji bo parastinê xweşikayî çêdikin û dixin destpêçka ku pê zarokan dipêçin.

Baweriya welatiyên herêmên Zagrosan jî piranî cureyên daran bûne, weke dara beruyê, yek ji darên ji bo baweriya parastina zarokan bi kar tînin jî dara tawiyê ye. Dara tawiyê li herêmên çiyayî şîn dibe, pir bilind, ji xwe bawer û bi xeml e. Çiqê dara tawiyê tînin qaşilê wê ser de dibin xweşik zirav dikin û paşê bi moriyan şêwe didinê û bi zarokan ve dikin. Weke sêgoşeya hermelê hinek din biçûk çêdikin, ruşiyê hermelê dozdeh in, yên wê du, sê û hinek caran jî çar in. Dibe ku çar ruşiyên wê jî wateya çar demsalan e. Dema diqedînin li ser milê zarokan bi kincê wan ve dikin. Hem gelek xweşik e hem jî weke baweriya welatiyên herêmê ji bo parastinê ye. Ev sîmge ne tenê parastina zarokan dike, her wiha ji bo parastina mal, bax, baxçe û ajalan jî bi kar tînin. Li herêmê ji çandiniyê zêdetir sewalvanî heye, ji ber wê jî weke zarokên xwe ji sewalên xwe jî hez dikin. Gelek caran wê sîmgeya parastinê bi berx an jî karikên xwe yên herî biçûk û xweşik ve dikin. Ji ber li gorî wan dema nezer li sewalek xweşik bikeve, ne tenê ew sewal dimire, mirin dikeve nava hemû sewalên wan ji bo wê jî dara tawiyê pêve dikin.

**Ji pîra xwe û dayika xwe fêr dibe**

Yek ji van jinan ku vî darikî xweşik û biwezin li hev tîne, di nava moriyan de şêwe dide û bi zarokan ve dike Hacer Tok e ku li Wargeha Penaber a Mexmûrê dimîne.

Tok ku di temenekî biçûk de ji dayika xwe fêrî vê destkariyê bûye, wiha qala hunera destkarî û zarokan ji nezerê diparêze dike: "Dema zarokbûm pîra min û dayika min ev dar despêkê bi wezin çêdikirin, paşê jî xweşik bi moriyan li hev danîn û bi zarokan ve dikirin. Ew karek mijulahî ye û gelek demê wan digirt. Ev mijulbûna wan bala min kişand û ez jî bi saetan li kêleka wan diruniştim û min li ber destê wan dinêrî. Bi temaşekirinê re ez jî hînbûm û min jî destpêkir. Destpêkê min alîkariya pîra xwe dikir, paşê jî min bi tena serê xwe çêkir. Ya despêkê min çêkir, bi berxika xwe ya herî zêde min jê hez dikir ve kir. Ji wê rojê heya niha ez jî weke pîra xwe ji vê darê bawer dikim û ji bo parastina zarokan çêdikim." ***MEXMÛR***



## Qeyûm mizgeft û dibistan firotin

Wezareta Karên Navxweyî di 19'ê tebaxa 2019'an de cara duyemîn qeyûm tayinî Şaredariya Bajarê Mezin a Mêrdînê kiribû. Piştî qeyûmê berê Mûstafa Yaman, Waliyê Mêrdînê Mahmût Demîrtaş tayinî şaredariyê kirin. Têkildarî nelirêtiyên qeyûman gelek belge û nûçe hatin weşandin. Li gorî nûçeya MA'yê qeyûm Mahmût Demîrtaş di civîna ewil a sala 2021'ê de beramberî deynên bacê mizgeft û dibistanek navçeya Artûklûyê firotin. Her wiha qeyûm trafoya ceryanê ya şaredariyê jî dewrî DEDAŞ'ê kir.
***MÊRDÎN***

## 'Ez kurd im, jin im û li vê derê me'

Danişîna doza Berdevka Tevgera Jinên Azad (TJA) Ayşe Gokkan li Dadgeha Cezaya Giran a Amedê ya 9'emîn hatibû dîtin û bi angaşta "endam û rêvebera rêxistinê" hat girtin. Gokkan di danişînê de xwe parast û wiha got: "Ez dewleta mêrserwer, zihniyet û parlamentoya wê nas nakim. Dewlet û qanûnên wê red dikim. Ez ji dewletê re serî danaynim. Ew min û mafên min red dikin, ji ber vê ez qebûl nakim. Ez kurd im, jin im û li vê derê me."
***AMED***

## Xwekuj ji Tirkiyeyê çûne

21'ê çileyê, li paytexa Iraq Bexdayê di saet 11.30'an de li qada bi navê "Qada Balafirgehê" êrîşên xwekujiyê pêk hatin. Li gorî rayedarên Iraqê di encama her du êrîşan de 32 kes mirin û 110 kes jî birîndar bûn. Ev teqîn piştî serdana şandeya leşkerî ya Tirkiyeyê pêk hatin. Endamê Lijneya Asayîş û Parastinê ya Parlamentoya Iraqê Bedir Ziyadî diyar kir ku kesên ku teqîna li Bexdayê pêk anîn ji Tirkiyeyê hatine Iraqê û piraniya wan ji aliyê hêzên ewlehiyê ve hatine girtin.
***BEXDA***


## Li Mexmûrê betlaneya dibistanan

Li Wargeha Penaberan ya Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) bi hezaran xwendevanên ji pênc pêşdibistan, çar dibistanên seretayî, du dibistanên navîn û dibistana amadeyî, bi dawîbûna dema yek ya sala xwendinê ya 2020-2021'an bi kelecan û kêfxweşiyeke mezin karnameyên xwe girtin. Ji rêveberiya dibistanê mamoste Silêman Tallî axivî û wiha got: "Di vê dema pandemiyê de li her derê perwerde bi rêya online tê dayîn, lê li vê derê mamosteyên me bêfikar ji bo xwendin vala derbas nebe dest ji perwerdeyê bernedan."
***MEXMÛR***

# Ji malbatan banga bibin deng

Navenda Nûçeyan

Çalakiya greva birçîbûnê ya ku li girtîgehan li dijî tecrîdê û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan hat destpêkirin, li 107 girtîgehan di meha 3'yemîn de berdewam dike. Emîne Bînîcî ku ji malbata wê 6 kes di girtîgehê de ne, bang li her kesî kir ku ji çalakiya greva birçîbûnê re bibin deng



Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê, di 27'ê Mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 21 sal in li Girtîgeha Îmraliyê ya Ewlehiya Bilind a Tîpa F tê girtin û şermezarkirina binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan, dest bi çalakiya greva birçîbûnê kirin. Çalakiya girtiyan bi biryardarî di meha 3'yemîn de berdewam dike.

Li Wargeha Penabaran a Şehîd Rûstem Cûdî (Mexmûr) jî, li dijî tecrîda li Îmraliyê, bi pêşengiya jinan di 18'ê kanûna 2020'an de, çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. Çalakiya li Saziya Malbatên Şehîdan a Mexmûrê dewam dike, di hefteya 7'emîn de ye.

Welatiyên li kampa Lavrîo ya Yewnanistanê dimînin jî bi pêşengiya Tevgera Ciwanên Şoreşger (TCŞ), Tevgera Jinên Kurdistanê ya Ewropayê (TJK-E) û Navenda Çanda Kurdistanê hat destpêkirin, di hefteya 5'emîn de dewam dike.

**Ji heman malbatê 6 kes**

Dayika Mehmet Bînîcî yê ku li Girtîgeha Tîpa T a Hejmara 2 a Rihayê û Îbrahîm Bînîcî yê li Girtîgeha Tîpa F a Sîncanê girtîne Emîne Bînîcî bang kir ku daxwazên girtiyan bi cih bînin. Bînîcî diyar kir ku ji 10 zarokên wê 9 jê di demên cuda de hatin girtin. Bînîcî anî ziman ku ji xeynî 2 zarokên wê 4 xizmên wê jî (Îsa, Mehmet, Emîn û Mahîr Bînîcî) di girtîgehê de ne û bang li her kesî kir ku ji çalakiya greva birçîbûnê re bibin deng.

**Daxwazan bi cih bînin**

Yek ji girtiyên tev li çalakiya girêva birçîbûnê bûye û di meha tebaxa 2017'an de li navçeya Germencik a Aydinê bi îdiaya "endamtiya rêxistinê" hatibû girtin Servet Aşikar e ku li Girtîgeha Tîpa T a Hejmara 2 a Şakranê ya Îzmîrê dimîne. Aşikar di hevdîtina telefonê ya 21'ê çileyê de ku bi malbata xwe re kiribû, diyar kir ku pêkanên keyfî yên li girtîgehê zêde bûne.

Aşikar banga hestiyariyê li raya giştî kir û ev peyam da: "Divê hikûmet daxwazên girtiyan bi cih bîne. Berî ku girtî jiyana xwe ji dest bidin, lazim e ku rayedarên dewletê guh bide daxwazên wan û bi cih bîne."

Berdevka HDP'ê Ebrû Gunay li navenda giştî ya partiyê civîna çapemeniyê li dar xist û mijarên di rojevê de nirxand. Gunay wiha got: "Ji du mehan zêdetir e mirov di nav bêderfetiyan de li ber xwe didin û îtirazî rewşa heyî dikin. Daxwazên girtiyan pir aşkera û zelal in. Bi hezaran girtiyên li zindanan ku ji aliyê desthilatê ve hatine girtin di serî de li ber tecrîda girankirî ya li Îmraliyê û binpêkirinên mafan ên li girtîgehan û neheqî û bêhiqûqiyan radibin û li ber xwe didin." Gunay got ku ji bo pejirandina daxwazên girtiyan dê têkoşîna xwe bilind bikin.

### Ev grev ji yên din cudatir e

Vedat Hasass ê 132 rojan di çalakiya greva birçîbûnê ya bi pêşengiya hevseroka KCD'ê Leyla Guven li dijî tecrîda Îmraliyê hatibû destpêkirin de mabû, diyar kir ku ev çalakî ji çalakiyên derbasbûyî cudatir e û banga pêşwazîkirina daxwazên girtiyan kir. Hasass wiha got: "Heya ku tecrîd bi dawî bibe wê vê çalakiya xwe bidomînin. Ji bo ku zextên li ser civakê bi dawî bibin, divê berî her tiştî tecrîd rabe. Divê daxwazên girtiyan bên qebûlkirin. Ji bo ku rewşeke neyînî rû nede, lazim e ku rayedar zû tevbigerin."

# Aqûbeta kesên hatine binçavkirin nayê zanîn

Zextên li ser aktîvîst, xwendekar, mamosta, welatî û rojnamgeran roj bi roj li başûrê Kurdistanê zêde dibin. Bi taybet li herêmên di bin serweriya PDK'ê de, gelek kes ji ber parvekirinên xwe yên li ser malperên civakî, tevlîbûna xwepêşandanan û ramanên xwe hatine binçavkirin. Yan jî kesên li dijî dagirkeriya dewleta tirk xwedî helwest in, tên binçavkirin û windakirin.

Li gorî nûçeya Rojnewsê heya niha 25 kesên li herêma Behdînan û Hewlêrê ji aliyê PDK'ê ve hatine binçavkirin û li asayîşa PDK'ê ya Hewêrê tên ragirtin. Bi taybetî mamosta Bedel Berwarî, Şêrwan Şêrwanî, Guhdarî Zêbarî, Umêd Beroşkî û Qareman Şukrî kesên li nav civakê tên nasîn, niha di zindana PDK'ê de tên ragirtin.

Li gorî agahiyên seroka Fraksiyona Goran û Cîgira Serokê Lijneya Mafê Mirovan a Parlamentoya Herêma Kurdistanê Gulistan Seîd daye, nêzî 70 kes ji aliyê asayîşa PDK'ê ve hatine binçavkirin. Gulistan got ku hemû kesên hatine binçavkirin hîn jî di zindanê de ne û tenê nasnameya 16 kesan li gel wan heye.

Di 22'ê kanûna 2020'an de, Wezîrê Karê Derve yê Amerîkayê Mike Pompe bi rêya telefonê bi serokwezîrê Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzanî re axivîbû. Pompeo piştî wê bi rojekê peyamek li ser twîtera xwe belav kir.

Pompeo ragihand ku wî bi Mesrûr Barzanî re azadiya çapemeniyê ya li Herêma Kurdistanê guftugo kiriye. Pompeo ji Barzanî re got; "Amerîka piştgiriya xwe ya ji bo azadiya ragihandinê ya li Iraqê didomîne."

Cara yekem malbatên kesên ji aliyê PDK'ê ve hatine binçavkirin, di 6'ê çileya 2021'ê de karîn zarokên xwe bibînin. PDK'ê ji bo hevîtinê, tenê 5 kêlî dem da malbatan. Ji wê rojê heya niha tu agahiyek li ser çarenûsa kesên hatine binçavkirin nînin.

Li gorî daxuyaniyên parêzerên xwebexş, hemû kesên li herêma Behdînan û Hewlêrê hatine binçavkirin, li derveyî qanûnê hatine binçavkirin. Parêzer dibêjin kesên hatine binçavkirin, bi hinceta 'tevlihevkirina asayîşa neteweyî' hatine binçavkirin.

Der barê kesên hatine binçavkirin de jî heya niha serokwezîrê Herêma Kurdistanê bersiva pirsên fraksiyonên li parlamentoyê nedaye. Seroka Fraksiyona Goran Gulistan Seîd beriya niha di daxuyaniyeke xwe ya çapemeniyê de diyar kir ku wan der barê kesên hatine binçavkirin de daxwaznameyek radestî serokwezîrê Herêma Kurdistanê kiriye, lê bersiva wan nehatiye dayîn.

Tevî hemû nerazîbûn û bangên rêxistinên navneteweyî, PDK roj bi roj li herêma di bin serweriya xwe de zextan zêde dike. Di 27'ê çileyê de hêzên PDK'ê bi ser mala rojnameger Qareman Şukrî ya li komelgeha Sîrê ya ser bi Duhokê de girtin.

Rojnameger Qareman Şukrî hat binçavkirin, hêzên asayîşê dikana Şukrî tevlihev kir û hemû kel û pelên li dikanê jî bi xwe re birin.

Rojnameger Qehreman Şukrî yê 24 salî, ev cara sêyem e ji aliyê PDK'ê ve tê binçavkirin.



## GELEK ZIMANZANÊN ME KODÊN ZIMAN XIRAB DIKIN

# Ez deyndarê zimanê xwe me

■ Rizoyê Xerzî

*Mêvanê we yê vê hefteyê dîsa xemxur û kedkarekî zimanê e ku salên dirêj ji temenê xwe di kar û xebatên ji bo zimanê kurdî de derbas kirine. Ji bo ji nêz ve, em kar û xebatên nivîskar û weşanger Qahir Bateyî nas bikin, me ev hevpeyvîn pê re kir.*

**Em Qahir Bateyî wekî nivîskar û xemxurekî zimanê kurdî nas dikin; mamosteyekî ziman çîroknivîs, weşanger nas dikin. Qahir Bateyî xwe çawa dide nasîn û niha bêtir bi çi re mijûle?**

Her gav xwe wekî deyndarekî zimanê kurdî dibînim. Ji bo xizmeta ji bo zimanê kurdî, parastin û pêşxistina zimanê kurdî her gav wekî deynekî mezin li ser milê xwe dibînim. Her ku dibînim zimanê kurdî di nav civakê de dihele, vê deyndariyê mezintir dibînim û dixwazim ku miqabilî vî deynî xizmeteke mezintir bikim û vî deynî hîn sivikitir bikim. Bi vê boneyê ev nêzî 25 salan e ji bo parastin û pêşxistina zimanê kurdî bênavber dixebitim. Belkî di çend salên destpêkê de min xwe wekî deyndarekî nedidît, lê ji 15 salan zêdetir e wisa xwe deyndar dibînim. Yanî çiqas ziman, çand û dîroka xwe nas dikim, her wiha talûkeya li ber ziman û çanda kurdî çiqas ji nêz ve dibînim û vê hîs dikim, ewqas xwe deyndar û berpirsiyar dibînim ku divê tiştekî ji bo kurdî bikim. Heke nekim, an jî kêm bikim dê xwe wekî gunehkarekî bibînim. Ji bo vê jî bi salan e ji bo xizmeta kurdî dixebitim. Heşt sal in jî wekî xwedî û edîtorekî weşanxaneya Sîtavê xebatên xwe dikim û rojê 15-16 saetan bi vî karî re mijûl im. Karê weşangeriyê karekî gelek zehmet e, mijûlî, baldariyê dixwaze. Ev jî dibe sedem ku mirov ji gelek xebatên din dûr bimîne.

**Tu gelek caran hatiyî girtin û binçavkirin, tu dikarî behsa sedem û çîroka xwe ya girtina pêşî bikî?**

Cara ewil ku ez hatim girtin, ez di pola yekem a lîseyê de bûm. Wê demê tevî temenê min gelek biçûk jî bû, li dibistanê di nav kar û xebatên siyasî de bûm. Hezkirina min ya kurdî hîn wê demê hebû. Min her tim li ser depreşa polê nivîsên kurdî dinivîsîn. Belkî ew bûne sedem ku ez zû bêm girtin. Di hezîrana 1993'yan de min qarneya xwe wergirt û çûm sûkê, li dikana hevalekî xwe rûniştî bûm hatim binçavkirin. Piştî îşkenceyên gelek xedar ku bandora wan hem fizîkî hem derûnî hîn jî li ser min e û 13 rojên binçavkirinê hatim girtin û çar mehan di girtîgehê de mam. Piştî çar mehan hatim berdan lê binçavkirin, girtin û mişextîbûn her berdewam kir. Hîn jî dema radizêm wekî ku dê serê siharê li derî bidin û bên min binçav bikin radizêm. Bi şev hema dengek bê, dibêjim qey hatine min bibin. Jiyaneke di nav psîkolojiyeke wisa de ye, jiyana min. Ji ber ku ji 93'yan û wir ve rojeke jiyana min a asayî çênebûye. Hîn jî ji derê dadgehan xilas nebûme. Temen xilas lê dadgeh xilas nebûn.

**Te kîjan berhemên xwe di zindanê de nivîsandin?**

Min di zindanê de sê berhem nivîsandin; du roman û çîrokek. Çîrok bi navê 'Perdeyê Reş' hatiye weşandin. Romanek beşek lê kêm e, xebata 15-20 rojan e. Beşa psîkoterapiya lehengê romanê ye. Hinek pisporiya psîkolojiyê dixwaze, lê mixabin ev çend sal in ji ber kar û xebata weşanxaneyê her tim didim paş. Romana din nîvco maye. Bêşansiya min bû. Dema min dinivîsî min nexweşiyek giran derbas kir. Piştî nexweşiyê heta hatim berdan min nekarî tiştekî bikim. Ji ber ku tedawiya min didît gelek giran bû. Min bi zorê dikarî dersa hevalan a kurdî bida. Ew jî gelek bi zor û zehmetî. Jixwe çend mehan piştî berdanê jî tedawî berdewam bû. Ji ber wê ew romana min wisa maye. Ji bo wê hem wext, hem serekî rihet divê. Her wiha divê ku biçim li gelek cihan bigerim ku di romanê de derbas dibin. Ev roman ji bo min gelek girîng e. Ez dibêjim piştî vê romanê êdî ez ê bêjim ez nivîskar im.

**Te ji bo zarokan kartên perwerdeya ziman ên biwêne amade kirine, tu dikarî behsa wê cerebeyê bikî ?**

Wekî tê zanîn kartên perwerdeyê îngilîzan derxistine. Rêbaza kartan ji bo perwerdeyê gelek bibondor e. Bi taybetî jî ji bo zarokan. Zanyar dibêjin tiştên dîtbarî zû dikevin serê zarokan û zû bi zû ji bîra wan naçin. Piştî îngilîzan ev rêbaza kartên dîtbarî gelek belav bûye, lê mixabin di kurdî de ev yek nîn e. Min jî di sala 2014'an de ji bo ku hindik jî be vê valahiyê dagirim û bi rêyeke hêsan û bibandor zimanê kurdî hînî zarokan bikim min ew qart amade kirin. Bi rastî jî gelek hatin ecibandin û gelek faydeya wan çêbû. Her çiqas di warê wêneyan de zêde ne profesyonel in jî lê dîsa jî dikarim bêjim xizmeteke gelek hêja ye.

**Te Rêbera Axiftinê ya sêzimanî amade kiriye. Piraniya pirtûkên bi vî rengî bi tirkî û kurdî-kurmancî hatine amadekirin, te bi çi armancê farisî û zaravayê soranî jî lê zêde kir?**

Wekî te jî got, ên heta niha tirkî û kurmancî ne, lê dema ez diçûm Başûr, an jî ku ji Başûr însan dihatin Bakur, min didît ku pêdivî pê heye ku di berhemeke wiha de soranî jî hebe. Her wiha ji bo farisî jî. Gelek turîstên îranî dihatin Wanê, lê di destê wan de tiştek nebû ku bi farisî û kurdî biaxivin. Ango merema xwe li gel kurdan bi kurdî bînin ziman. Dîsa li tirkî dizivirîn. Îca ez fikirîm ku rêbereke axaftinê ku tê de soranî û farisî jî hebe dê hem ji bo zimanê kurdî bibe xizmetek baş hem jî dê kesên bixwazin kurmancî, soranî, farisî û tirkî hîn bibin bibe çavkaniyeke baş. Bi vê mebestê Rêbera Axivtinê ya bi sêzimanî û bi du zaravayên kurdî hat amadekirin.

**Di van salên dawî de, em dibînin pirtûkên kurdî zêde dibin axaftina bi kurdî di nav gel de kêm dibe. Wekî weşangerekî tu vê yekê çawa dinirxînî?**

Mixabin her diçe, zimanê kurdî di nav civakê de dihele, ber bi windabûnê ve diçe. Bi taybetî jî êdî nifşa nû, gelek li kurdî û çanda kurdî biyanî ye. Ev yek metirseyeke gelek mezin e ji bo kurdî. Zêdebûna berhemên kurdî ziman ji talûkeyê rizgar nake. Ku ev rewş wiha berdewam bike heta bîst salên dî êdî zimanê kurdî dibe zimanê kesên entelektûel, dê bibe zimanê komek kesên ku bi kurdî re serê xwe diêşînin. Mixabin êdî nabe zimanê civakê. Di vî warî de bi qasî dewletê-bi ya min ji dewletê zêdetir jî- siyaseta kurdan, sazî û dezgehên kurdan, ango ewên pêşengiya civaka kurdan dikin gunehkar in. Ew bixwe jî aliyekî helandina kurdî ne. Rojekê dîrok dê hesabê vê yekê ji wan bipirse û di meseleya windabûna ziman û çanda kurdî de navê wan dê bi reşbînî li rûpelên dîrokê were nivîsandin. Belkî îro ev yek zêde neyê dîtin, lê bila bi yeqîn bê zanîn ku ev yek wiha ye. Ew aliyekî helandina kurdî ne, ew bi qasî dewletê gunehkar in û navê wan li rûplên dîrokê reşbîn tê nivîsandin...


Meselaya bişaftina li ser kurdî gelek gelek kûr e. Kodên zimanê kurdî tên guhertin. Êdî kesên ku bi kurdî re mijûl in, kesên ku wekî zimanzanên kurdî tên nasîn bi tirkî difikirin û wê fikirînê bi kurdî pêşkêşî xwendeyan dikin. Ev yek talûkeya herî mezin a li ser kurdî ye. Dema bi kodên zimanekî hat lîstin ew ziman çû. Dema kod xirab bibin, piştî pêncî salên din zimanekî bêbingeh dimîne, zimanekî wergera tirkî li holê dimîne. Wê demê kurdî nabe zimanekî xwedî dîrokeke qedîm. Dibe zimanekî zirek ku dişibe tirkiyê. Aha ev yek herî zêde min diêşîne. Tiştê xewa şevan li min diherimîne ev yek e. Mamosteyekî gelek xwedî ked û têkoşerekî zimanê kurdî, pirtûka wî ya rêziman çap bûye, di facebooka xwe de parve kiriye "pirtûka min ji filan weşanxanê derket". Gelo "derket" çi ye? Pirtûk çawa derdikeve, diçe ku derê? Li şûna ku bibêje "pirtûka min derçû" dibêje derket. Di ferqa vê yekê de nîn e ku hevoka wî rasterast wergera tirkî ye. Nizane ku tu eleqeya vê hevokê bi kurdî re nîn e. Îca bifikire ku zimanzanek wiha bike, rewşa kurdî çiqas xirab e. Kêmasiya me hemû kesên ku em bi kurdî re eleqeder in; bi taybetî jî ewên ku em wan wekî zimanzan û pisporên zimanê kurdî dizanin ew e ku em ji civakê qut bûne, em naçin nav civakê. Em naçin wan deran cihê ku ruhê kurdî lê dewlemend e, cihê ku kodên zimanê kurdî xirab nebûne. Ez kengî bi van tiştan hesiyam? Dema ku van salên dawiyê hem li Başûr, hem li Rojhilat û hem jî li Bakur hinekî li wan cihan geriyam, min li wan deran dan û standin kirin, min hin xebatên folklorê kirin, di dan û standinên bi gel re min dît ku ew mirovên gundî gelek ji min baştir, gelek ji zimanzanên me baştir bi kurdî dizanin. Min dît ku kurdiya wan ne wergera tirkî ye. Min dît ku li cem wan kurdiyeke saf û paqij heye û ez wê demê pê hesiyam kodên zimanê me xirabûne. Mixabin gelek zimanzanên me jî van kodên ziman xirab dikin û dibin mînakên gelek xirab ji bo nifşa nû û zimanê kurdî.

**Di van demên dawî de li ser rastnivîsê tevlihevî zêde bûne. Her weşanxane li gorî xwe rastnivîsekê ji xwe re dike bingeh, li gorî te ev rewş bi xwe re çi tîne; tu der barê vê yekê de çi difirî û weke weşanxane hûn kîjan rastnivîsê esas digirin?**

Tu ji min bipirsî, heta çend sal beriya niha ev mesela rastnivîsê ji sedî 90 hatibû çareserkirin. Belkî ji sedî 10 pirsgirêkên rastnivîsê hebûn, lê ew jî ne pirsgirêkên mezin bûn. Mixabin van salên dawiyê hin xebat li ser navê rastnivîsê hatin kirin, tevliheviyeke gelek mezin derxistin. Li şûna ku kil bikin bi ya min kul kirin. Bi rastî gelek tiştên pir eletewş derxistin holê. Belkî di hin mijaran de rastiyên wan hebûn, lê di gelekan de ya rastî jî xirab kirin, tiştê ku danîn şûnê ji eletewşiyê zêdetir ne tu tişt bû. Heyf bû ku ewqas ked hate dayîn, lê encam bû tevlihevî. Tişta xirab jî ew e ku wekî referans tên dîtin yan jî dixwazin bên dîtin. Jixwe tevliheviya mezin jî li vir derdikeve. Dibêjin dînek kevirekî davêje binê bîrê deh biaqil nikarin derxînin. Ew jî bûye wekî navên mehan. 10-15 sal beriya niha di konferanseke çapemeniyê de li ser pêşniyarekê navên mehan hatin guherîn û bi navê "meha çile" navê mehekê kete nav navên mehan. Halbûkî bi navê çile navê mehekê tune ye di kurdî de. Çile du wextên salê ne. Çileyê zivistanê heye, çil rojên herî sar ên salê ne. Yek jî çileyê havînê heye. Ew jî çil rojên herî gerim yên salê ne, lê bi pêşniyara nezanekê û destrakirina beşdarên konferansê bû biryar ku çile bibe navê mehekê û ji hingî ve ev şaşî di çapemeniya kurdî de tê kirin, bêyî ku bizanin tehrîbata wê çiqas mezin e.

Du mijar ne tê de, em wekî weşanxane li se rêbaza xwe ya berê ne. Wan du mijaran jî heke nivîskarê berhemê israr bike em wisa dihêlin. Wekî din çi be bila bibe em di rastnivîsa xwe ya berê de bi israr in û tawîz nadin.






Heta çend sal beriya niha, ev mesela rastnivîsê ji sedî 90 hatibû çareserkirin. Belkî ji sedî 10 pirsgirêkên rastnivîsê hebûn, lê ew jî ne pirsgirêkên mezin bûn. Mixabin van salên dawiyê hin xebat li ser navê rastnivîsê hatin kirin, mixabin tevliheviyeke gelek mezin derxistin



## Qahir Bateyî kî ye?

Di sala 1974'an de, li gundê Bêmbo yê girêdayî Şemzînana Colemergê hatiye dinyayê. Dibistana seretayî li gund û ya navîn jî li Şemzînanê kuta kirine. 1993'yan dema lîseyê dixwine, li Geverê tê girtin û şeş mehan di zindanê de dimîne. Piştî berdanê dîsa qaçax dibe û salekê li başûrê Kurdistanê dimîne. Di sala 1997'an de mecbûr dimîne ku koçî Stenbolê bike. Heta niha gelek berhemên xwe çap kirine û pê re jî karê weşangeriyê dike.

# Romana 'Sor' û 'Mor' û Hêvî

Yaşar Eroglu

**Li gorî min romana Stranên Sor Nivîştên Mor a Rênas Jiyan, hêjayî nirxandinê ye û dereng jî maye. Min roman xwend û ez ê li gorî xwendina xwe nirxandinekê li ser vê romanê bikim**

Weke gelek qadên gotar û nivîsara kurdî romana kurdî jî di qonaxeke girîng re derbas dibe. Pir berhem weke roman tên weşadin, derdikevin qada weşanê. Romanên bi kurdî derketine pêş me, gihîştine hejmareke bilind. Ji bilî naverok û pirsgirêkên aliyê wêjeyî, bi serê xwe tenê ev hêviyeke mezin e ji bo ziman û wêjeya kurdî.

Di sala 2018'an de, bi navê Stranên Sor Nivîştên Mor romaneke Rênas Jiyan hatiye weşandin. Ji 220 rûpelan pêk tê û ji weşanên Belkiyê derketiye. Ew jî yek roman e ji romanên salên dawî derketine. Li gorî min romana Stranên Sor Nivîştên Mor a Rênas Jiyan hêjayî nirxandinê ye û dereng jî maye. Min roman xwend û ez ê nirxandinekê li ser bikim.

Rênas Jiyan teknîkeke nivîsandinê ya nû ceribandiye. Li gorî vê teknîkê armanca nivîsa xwe serkeftî gihandiye encamê. Nivîskar di romanê de sê rêbaz bi kar anîne. Beşek weke parçeyên nivîştê, yek weke kes/ên li dû nivîştê digerin, beşek jî ji rojnivîsk û êşa xwendekarekî ku ji mirina eta (abla) xwe aciziya wijdanê dikişîne pêk tê.

Serê pêşîn ez rexneyên xwe derpêş bikim. Bi min nivîskar çend beşên di serê romanê de bi xwe yekser ketiye nav mijaran û bi nirxandinên zêde mudaxaleyî romanê kiriye. Eger nirxandinên xwe, ne bi devê xwe, bi awayekî din pêşkêş bikira û li romanê bida xwarin wê baştir bûya. Lê dema ku nivîştger ango Bêrîvan li xwe vedigere ev mudaxele kêmtir dibin û vegotina romanê baştir diherike. A din jî bo navê berhemê pirsek di serê min de bêbersiv ma. Min di romanê de gelek nivîşt û nivîştgerên 'mor' dîtin. Her wiha gelek gotinên sor jî lê ez rastî stranên 'sor' nehatim. Gelo stran çawa sor bûn û navên xwe çawa dan pirtûkê weke pirs di serê min de ma û li gel bikaranîna zimanekî dewlemend hinekî zêde herêmî maye û xeta yan jî tercîhên şaş ên redaksiyonê pir in.

Kengî min dest bi romanê kir û pê de çûm, di serî de bi min xerîb hat ku ji ber çi mijarên bi hev re bêeleqe hatine bicihkirin. De min got belkî nivîskar ji bo kêmasiya rûpelan telafî bike, romanê ji kurteromanê xilas bike ev rê ceribandiye. Lê gava min qedand, min bikaranîna hunereke serkeftî dît. Binêrin ku hûn bixwazin avahiyeke çav û dilkêş çêkin, eger hûn bingeha wê qewî daneynin dema serban xilas bû, dibe ku bi ser we de tep bibe û hûn di bin de bimînin. Bi rastî serê pêşîn min ev xetere dît ku romaneke baş bi vî awayî kêm bimîne. Lê na, huner tiştekî wisa ye ku tu ji kevirekî xilîxar peykerekî pir bedew derxî û ew peyker derketiye jî.

Rênas Jiyan mijarên gelek kompleks wisa baş honandine ku bi riya lehengên xwe mijar gihandine hev, bi çakûç, miqar, bîj, rende û vernîkê hostatiyeke bikêrhatî derxistiye; ji tirşî, zebeş û hêkan ango gelek hêmayên ku nayên cem hev, di metbexeke xizan de xwarineke gelek biçêj çêkiriye. Ya pir binirx jî ev e, heta çend rûpelên dawiyê jî mirov fikar dike ku ev romana mijar jihevdûr wê çawa bi ser hev de bê û biqede. Heta dawiyê we bi xwe re dikişîne, bi meraq dawiyê pê re digihîne. Dîtina vê rêbazê bi serê xwe merîfeteke mezin e. Ji bilî pêciriyê (qabiliyet) gelek serêşandin û lêhûrbûnê jî dixwaze. Honaksaziya romanê derdikeve lûtkeyê. Ji bo romana kurd-kurdî serkeftin û qonaxeke gelek girîng e.

Zimanê romanê serkeftî ye. Zimanekî nerm, herikbar xwe ji rijîbûnê dûr xistiye. Biwêj û gotinên pêşiyan, metelok, meselok û hwd ruhê ziman in. Ji ber ku ziman ne tenê ji hevok û peyvan pêk tê. Nivîskar xwestiye her mijar heta paragrafa wî baş bê fêmkirin, hêma û wêneyên xweş di serê xwînerên romanê de çêbibin gelek biwêj, gotinên pêşiyan û dewlemendiyên din ên zimên bi kar anîne. Bikaranîneke taybet jî heye ku hin peyvan li ser kaxiz dide reqisandin, di dorhêla pênûsa xwe de seqayeke xweş pêk tîne. Mirov ji zimanê xwe hez dike, hêz digire, pê kêfxweş dibe.

Felsefe, mantiq, raman û peyam hene. Em ji romanê pê dizanin ku fikreke nivîskêr bixwe heye û di romanê de xuya ye. Jixwe dixwaze, di jiyana ku wî aniye ziman de, ew fikra bi riya hunerê ji nû ve bê afirandin. Lê mebesta min ne ew e, gava tu rûpelên romanê vedikî yan digirî ew xweserî di giştiya romanê de li rûyê te dixe, xwe dide hesandin. Ev taybetiya nivîskêr bi xwe ye. Peyamên ji bo ax, welat, ziman, jin, şervan, bawerî, xerîbî û biyanîbûna ji xwe, vegera li xwe, dijkurdîtî û gelekên din helbet ên me giştan in lê di romanê de li gel wê rastiyê ew aîdî wî bixwe ne; rengê xwe, dengê xwe û karakterê xwe lê aniye. Bi vê taybetiyê Bêrivanê, Azad, Xoce Xelef, Dayika Emîneyê bi me dide hezkirin, diya Bêrîvanê Gulnazê, xalê wê, dide ber kerba me, Tolga, Fûnda dibin dijberên me, heyfa me bi Şemsayê û evîna wê tê. Dawiya dawî mexdûriya êzidiyan bi pejneke nixumandî radixe ber çavan, rûmetê nîşan didê.

Vegotina ji devê jinekê bi devê mêrekî pir zehmet e. Helbet jinek dikare rastir vê yekê bîne ziman lê dê û xwîşkên me jî hene ku em kêm-zêde çav û guhnasê jiyana jinan e. Weke nivîskarekî mêr Rênas Jiyan heqê vê derûniyê jî dayê, bi ser ketiye.

Roman pêşî meraqa mirov radike ser pê, paşê dikişîne nav xwe; pirs û pirsgirêkan çêdike, piştre xwe digihîne dil û mêjiyê mirov; meraq, nefret, kîn, hestewarî, fikar, kelecan, xwezî, liberxweketin, coş, rik-hêrs û hwd digihîne cihê ku nivîskar hêlîna wan bi vegotina xwe amade kiriye. Erdnîgarî, hest, êş, serpêhatî, mirov, gotin, kirin, dert, keser, kul, hêvî û hwd ên me ne, nas in. Êdî seranser jiyana me ev e. Em tenê xwe di romanê de nabînin, em ji gundîtiya xwe derdikevin, bi riya romanê digihîjine deriyê li pêş me vebûye ku êdî bi hunerê hatiye neqişkirin. Ferqa wê ji roman û jiyana asayî ev e; ya pêşîn xaliya binexş a ji destê jinên tevndar, a din jî mîna kulavê gundan e. Yanî Rênas Jiyan dipeyitîne ku nivîskarekî kurd bi jiyana civaka xwe, bi riya afirênderî û hunera xwe dikare têkeve riya wêjeya cîhanê. Ev xeyal nîn e.

Ev jiyana me ye. Divê em bi ziman û awayê cur bi cur vegotinên vê jiyanê bixin nav manewiyat, çand, ruhiyat, mêjiyê xwe yê nivîskî û bi hunereke dilkêş bixemilînin, binexşînin, bibiriqînin. Bawer bikin em ê bikaribin. Tenê em dilê xwe bi hêmayên ji derveyî xwe re nebijînin. Em cinsiyeta ferîşteyan, xeyb û xeyalên xwe yên çilqijî zêdetir divê bi zimanê hunerê rastiya civaka xwe binivîsînin.


Di mêjiyê gelek kesan de têdemayîneke (obses) wiha heye, "yaho êş, keser, mirin û mayîn heta ku? Ji ber çi em xwe bistrên, xwe bixwin? Divê em ji sînorê xwe derbas bibin, bigihîjin wêjeya dinyayê."


Jixwe gelekên wan qet rastiya xwe nenivîsîne weke nivîsîne xwe nîşan didin. Lê divê bê zanîn ku riya derbasbûna ji sînorên xwe ber bi wêjeya dinyayê ji berderê me re derbas dibe. Dinya ji mirovan dipirse, 'bi qasî milyonan telebayt êş, keser, dram, karesat, evîn û serpêhatiyên te hene, te ew nivîsîn ku derbasî xeyal û honakên min dibî? Serê pêşîn ber deriyê xwe paqij bike, paşê'. Divê berê em bi xwebûna xwe herin li deriyê dinyayê bixin. Lê bi gotin û zimanê hunerê…

Lê binêrin, Dostoyevskî, Tolstoy, Hûgo, Şolohov, Gorkî, Dîkinson, Zweîg, Eco, Serwantes, Kafka, Kundera û bi dehan nivîskar bi jiyana welatên xwe, mijarên nas bûne klasîk. Rastî ev e, ji bilî vê çîrokên xeyalperest in. Ha eger em bêjin wêjeya post modern û kaos jî wêjeya cîhanê ye, dev ji klasîkan berdin. Wêga jî problem ne di wê derê de ye, problem di me de û mêjiyê me de ye. Em ne mecbûr in ku kaos û tazyîqa teşeya jiyana post-modern a ku li ser welatên paşmayî ferz û werdikin re bêjin wêjeya cîhanê. Kî wisa lê binêre xwe dixapîne. Yên ku wisa difikirin dikarin bidin dû xeyal û dilbijînên xwe, bila rastî ji me re bimînin.

Em kêfxweş in ku yên mîna Rênas Jiyan û yên din hene, di nav bostan û rezên me de berhemên hêja dimeyînin. Bi qasî xwarina wan berheman, baxçe û baxvaniya her kurdekî jî ji bo wî bax û bostanî kêfxweşî ye.

Ji bo romana kurdî Rênas Jiyan hêviyeke xurt e. Ked û berhemên hêja û birûmet tên silavkirin. Ez jî keda wî silav dikim, dibêjim saet xweş. Dest û tiliyên te ter bin Rênas Jiyan.



## Çend helbestên Ehmedê Huseynî

Li wir bimîne
Şing-Ola minê
Li wê çolistana serberdayî
Bend û ayetên xwedê
Ji pêxemberên serdemê re bixwîne..
Destekî xwe ji Mehbadê re bişîne
Bila di sînga Çarçirayê de
Gula sor a şehîdan biçîne..
Destekî xwe ji Hewlêrê re bişîne
Bila Xanoyê Lepzêrîn
sirûdên Kela Dimdimê
Li meydanên azadiyê vejêne..
û baskên xwe,
Ji Birc û Kelehên Amedê re bişîne,
Bila li Deriyê çiyê
şêxê Pîranê,
Bi destê pêxemberekî bigire,
û bagera Zagrosan bi gopalê xwe rawestîne..
Dilê xwe yê ji genim û zersosinan
ji Qamişlokê re bişîne,
bila Çekjîn û Hogiran
Bila Helepçeya min a nazik
Li kuçe û kolanan
Li goristana şehîdan bibîne..
Li wir bimîne,
û bi ava gulan rêbaza evînê binivîsîne..
Birûskvedana qederan li qederan vegerîne
Destên xwe li newqa çiyê bialîne
û xwîna xwe di dergûşa xwedawendan de
Bilorîne
Bilorîne Şing-Ola minê bilorîne:
Tac im tac
Taca serê Kurdistan im.
Bilorîne..
**

Li wir bimîne..!!
Li zeviyên temenê min
Kulîlkên evîna xwe biçîne..!!
**

Li wir bimîne
Yê zimanê wî dilerize ez im
Yê giyanê wî dilerize dîsa ez im
De min bi ewrên sînga xwe binixumîne
**

Li wir bimîne
Ger birayekî birayê xwe kuşt
Bi çavekî bigirî
Û çavê din jî birijîne
Lê li wir nemîne..!!
**

li wir bimîne
Nameyên poşmaniya min bixwîne
Dilê min veke û xwe tê de bibîne
Ruhê min veke û ji min bistîne
Helbesta min jî veke
û li goristanên vê Rojavayê bigerîne
Li wir bimîne
Hetanî ku hezkirina min ev e
Bila dilê te ji min nemîne
**

Li wir bimîne..!
Min di nav bijangên xwe de
Mîna ewrekî giran hilîne..!



## Hevdîtinên Zerîf berdewam dikin

Wezîrê Karên Derve yê Îranê Mihemed Cewad Zerîf û Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Mevlut Çavuşoglu li Stenbolê civînek kir. Her wiha Zerîf dê bi serokomarê Tirkiyeyê Tayyîp Erdogan re jî bicive. Her du wezîran piştî hevdîtinê daxuyaniyek da. Zerîf bal kişand ser peywendiyên Îran û Tirkiyeyê û diyar kir ku di rojên dijwar de Tirkiye û Îran hevkar in û aşkera kir ku dê di demeke nêz de dema serdana Erdogan a ji bo Tehranê diyar bikin. Beriya niha bi demekê Cewad Zerîf çûbû Rûsya, Azerbaycan, Ermenistan û Gurcistanê. ***ENQERE***



## ‘Hêzên xwe ji Lîbyayê vekişînin’

Sefîrê Amerîkayê yê li Neteweyên Yekbûyî Richard Mills li civîna Neteweyên Yekbûyî axivî. Mills ragihand ku Amerîka ji Tirkiye û Rûsyayê xwestiye hêzên leşkerî û çeteyên li Lîbyayê paşve vekişînin. Richard Mills di civîna Konseya Ewlehiyê ya girêdayî NY’yê ya girêdayî Lîbyayê de wiha got: “Rûsya û Tirkiye jî di nav de em bang li tevahî aliyan dikin ku rêz li serdestiya Lîbyayê bigirin û mudexeleyên xwe yên li Lîbyayê yekser bi dawî bikin.” ***WASHINGTON***

# Daxwazên şengaliyan ên ji Bexdayê

Navenda Nûçeyan

**Piştî gefên Tirkiyeyê yên li ser Şengalê, şandeyek ji Rêveberiya Xweser a Şengalê serdana Bexdayê kir. Şandeyê bi gelek aliyan re hevdîtin kirin û daxwaznameyek parve kir**



Di 9’ê cotmeha 2020’an de hikûmeta navendî ya Iraqê û hikûmeta başûrê Kurdistanê bi daxwaza dê hêzên Rêveberiya Xweser ji Şengalê derkevin û hêzên girêdayî Iraqê derbasî Şengalê bibin, peymanek îmze kiribûn. Bi mehan e civaka êzidî li hember vê peymanê li ser pêyan e, li konan nobetê digirin û çalakiyan li dar dixin.

Tê zanîn ku di 18’ê çileyê de Wezîrê Parastinê yê Tirkiyeyê bi şandeyekê serdana Bexda û Hewlerê kiribû û der barê dagirkirina Şengalê de daxwazên xwe hem bi Bexda û hem jî bi rêveberiya Hewlêrê re parve kiribûn. Piştî gefên Tirkiyeyê yên li ser Şengalê, şandeyek ji Rêveberiya Xweser a Şengalê serdana Bexdayê kir. Şandeya ku ji nûnerê PADÊ, TAJÊ, Desteya Eşayîrî ya Şengalê û Meclisa Rêveberiya Şengalê pêk hatî, li Bexdayê hevdîtin kirin. Şandeyê herî dawî bi serokwezîrê Iraqê yê berê Heyder Îbadî, cîgirê sefîrê Misrê û yê Rûsyayê re civiya.

Şandeya Şengalê piştî hevdîtinan bi daxwaznameyekê daxwazên xelkê Şengalê pêşkêşî berpirsên Iraq, Misir û Rûsyayê kir û xwest peymana li ser Şengalê were betalkirin.

**‘Peyman bêyî îradeya gel e’**

Şandeyê di daxwaznameyê de diyar kir ku peymana 9’ê cotmehê tenê di navbera Bexda-Hewlêrê de ye û ji bo vê yekê jî hewce ye were betalkirin û wiha got: “Di peymanê de aliyê siyasî yê têkildarê peymanê ango bêtirî 250 hezar welatiyên êzidî yên Iraqê li Şengalê hatine dûrxistin û der barê lêhûrbûneke vê peymanê de nêrînên wan nehatine wergirtin. Peyman tenê berjewendiyên aliyên îmzekirî diparêze. Ev peyman bêyî ku rêzê ji nêrîna wan re bigire hatiye îmzekirin.”

**‘Rêyên ceribandî...’**

Her wiha şandeyê da zanîn ku heta niha tu hesab ji hêzên leşkerî yên PDK’ê yên dema êrîşa çeteyên DAIŞ’ê di 3’yê Tebaxa 2014’an de li dijî Şengalê, vekişiyane nehatiye xwestin û ev tişt anî ziman: “Ev yek bû sedema pêkhatina komkujiya li Şengalê û revandina bi hezaran êzidiyan. Ev peyman dê rêya vegera vê hêza ku ji Şengalê vekişiyaye bi hêsanî veke û ev yek jî metirsiya ku dê dubare DAIŞ êrîş bike bi xwe re tîne. Ji bo vê jî gelê Şengalê vê peymanê qebûl nake. Rêyên ceribandî divê neyên ceribandin”

**‘Rê li ber koçberan vekin’**

Şandeyê der barê vegera koçberên êzidî de ragihand ku hikûmeta Başûr divê şert û mercên hêsan ji bo vegera koçberan amade bike û daxwazên xwe yên der barê vê mijarê de wiha bi rêz kirin: “Rêveberiya kampan, rêveberiya navçeyê, qeymeqam, asayîş, Meclisa Karûbarên Koçberan, beşa wezareta penaber û koçberan a navendî, erêkirina dîwana parêzgeha Duhokê. Ev sazî li hember daxwaza vegera koçberan bi zanebûn dereng dihêlin û ev yek jî hêviya kesên dixwazin vegerin dişikîne. Ji ber wê di kampan de dimînin. Rêya veguhastina ji kampan bi rêyên Duhok – Sihêla – Şengal, Duhok – Bendava Mûsilê – Şengal, Duhok – Mûsil – Şengal werin hêsankirin. Bi awayekî lezgînî divê alîkarî ji kesên ku vegeriyane Şengalê bê dayîn. Divê li Şengalê avahiyên hatine hilweşandin, kesên şehîd û birîndar bûne û her wiha hatine rewandin werin tespîtkirin. Heta niha tu xaniyekî hilweşandî yan şehîdek an kesekî windayî li giştî Şengalê, ji bo tu tiştî û kesî tezmînat nehatiye dayîn. Tevî destdirêjî û komkujiyên li Şengalê pêk hatine ev tişt nehatiye kirin.”

**Divê rêveberiya heyî bê naskirin**

Şandeya Şengalê di berdewama daxwaznameyê de ragihand ku ew dixwazin qanûnek were derxistin ku li gorî wê Şengal rêveberiya xwe ya xweser pêk bîne û ji nakokiyên navneteweyî, herêmî û hundirîn li ser erdnîgariya Şengalê xilas bibe û wiha got: “Ji ber civaka êzidî rastî qirkirinê hatine divê hikûmeta navendî û civaka navneteweyî rêbaza tazmînatê bidin pêşiya xwe. Di vê çarçoveyê de pêşkêşiya qurbaniyan were kirin û rêveberiya wan a xweser were erêkirin da ku ji nakokiyên siyasî yên li ser ax û nasnameya wan rizgar bibin. Hewce ye ku asîmanê Şengalê li êrîş û destdirêjiyên hêzên herêmî were girtin.”

Şandeyê diyar kir ku ew dorpêçkirî ne, hemû çûn û hatina di navbera Şengal, başûrê Kurdistanê, Mûsil û Duhokê de gelekî dijwar bûye û wiha got: “Ji ber vê yekê pêdiviya me bi çareseriyeke lezgîn heye. Rêya tekane ya bi bakurê Sûriyeyê re, deriyê Bareyê ye û divê alîkariya mirovî û tenduristî bê wergirtin. Ji ber vê yekê em dixwazin çûn û hatina di navbera Şengal û bakurê Sûryeyê re were hêsankirin.”

### Şengalî li ber xwe didin

Welatiyên Şengalê di çerçoveya li dijî peymana Bexda û Hewlêrê, bi armanca piştgirîdayîna Asayîşa Êzidxanê, ev zêdetirîn du meh in bi dirûşma ‘Em hemû asayîş in’ li pêşiya Navenda Asayîşa Şengalê kon vedane. Şêniyên Şengalê kom bi kom serdana konê berxwedanê dikin û piştgiriya xwe ya ji bo çalakiyê tînin ziman. Derbarê çalakiyê de şengaliyan diyar dikin heta daxwazên wan pêk neyên dê dev ji çalakiyên xwe bernedin û li hemberî serînetewînin. ***ŞENGAL***



Xweşkanî

Felemez Ulug

# Gefên Tirkiyeyê û welatên Ewropayê

Tirkiye bi hewildanên xwe yên provokatîf li Rojhilata Navîn bi qasî ku pêşî li pevçûn û provokasyonan vedike her ew qas jî pêşî li aştiya herêmê digire. Rejîma AKP-MHP’ê bi liv û tevgera xwe ya li Derya Spî dixwaze heman polîtîkayê li ser welatên din jî ferz bike.

Di vê herêmê de bi Yewnanistanê re di nav nakokiyan de ye, ji bo welatên Ewropayê jî peyameke vekirî ye. Lewma ev bûyerên di navbera Tirkiye û Yewnanistanê de diqewimin ji nêz ve hemû welatên endamên Yekîtiya Ewropayê jî eleqedar dike.

Sala borî bi vekirina deriyê sînor ê di navbera Yewnanistan û Tirkiyeyê de ku bû sedem bi hezaran penaber êrîşî sînorê Ewropayê bikin, krîza heyî kûrtir kir. Ev hemleya Tirkiyeyê ji aliyê gelek welatan ve weke şantajê ango weke gefeke li ser welatê Ewropayê hat dîtin û nirxandin.

Lê, dewleta Tirkiyeyê ji ya xwe nehat xwarê û vê carê berê xwe da Deryaya Spî. Ev herêma ku çavê hemû welatên xwe weke pêşengên hêzên cîhanê dibînin bi vê ve bû rojeva sereke. Dewleta Tirkiyeyê bi armanca lêgerîna gazê û petrolê keştiyên xwe yên sondajê di bin parastina keştiyên cengê şand dora giravên Yewnanistanê û bi mehan xebata lêgerîna petrolê kir. Ev hemleya Enqereyê jî mîna krîza penabaran di navbera Yewnanistan û Tirkiyeyê de bû sedema nîqaşên mezin.

Di serî de welatên Ewropayê gelek welatên cuda ji bo ku krîza heyî bê çareserkirin weke navbeynkar xwestin rewşê aram bikin, lê dewleta Tirkiyeyê bi sedan caran balafir û keştiyên cengê yên artêşa Tirkiyeyê, sînorên hewayî û deryayî yên Yewnanistanê binpê kirin. Bi van kiryarên xwe dewleta Tirkiyeyê, ligel mafê serweriya Yewnanistanê, hiqûqa deryayî û hemû hiqûqa navneteweyî jî binpê kir.

Welatên Ewropa li hember vê bêmafiya dewleta Tirkiyeyê bê deng neman û dewleta Tirkiyeyê ji bo hin pêkanînan hişyar kirin. Lêbelê hêza Enqereyê êdî têrê nake bikaribe weke berê vê polîtîkaya xwe ya êrîşkar li Derya Spî bimeşîne. Lewma jî rêvebiriya Erdogan careke din xwe avêt bextê Yekîtiyê û wezîrê derve Mevlut Çavuşoglu şand Brukselê.

Helbet Enqereyê baş dizanibû ku riya diçe Brukselê di Atînayê re derbas dibe û lewma jî bi lez banga diyalogê li Yewnanistanê kir. Piştî vê bangê, di navbera her du dewletên li dora Deryaya Egeyê de hevdîtin hatin pêkanîn.

Ji sala 2002'an û vir ve herî kêm 60 hevdîtinên bi vî rengî pêk hatin. Sînorên deryayî û hewayî yên li Ege û Rojhilata Deryaya Spî, statuya giravên Yewnanistanê yên nêzîkî Tirkiyeyê û parvekirina çavkaniyên deryayî mijarên van hevdîtinan bûn. Heta niha ji van hevdîtinan tu encameke erênî derneketiye û berevajiyê vê, navbera her du dewletan her diçe xirabtir dibe.

Lewma jî her du dewlet hêzên xwe yên deryayî û hewayî yên li Deryaya Egeyê bi dehan salan e xurtir dikin. Hêjayî gotinê ye, di dema hevdîtinên dawî de Yewnanistan ji bo kirîna balafirên şer ên Rafael, bi Fransayê re peymanek îmze kir.

Li gorî peymanê berdêla 2.3 milyar euroyî wê Atîna ji Fransayê 18 balafirên Rafael bikire. Ji vê peymanê jî diyar dibe, her du alî tu carî bi hev bawer nabin û dîplomasiya wan li ser bingeha hêza wan a leşkerî bilind dibe. Divê em ji bîr nekin ku Yewnanistan welatekî endamê Yekîtiya Ewropa ye. Lewma êrîşek li ser vî welatî bê kirin wê nêzîkatiya welatên Ewropayê jî di pêşveçûna van êrîşan de diyarker be.

Li ser krîza heyî di hefteya borî de li Brukselê wezîrên karên derve yên welatên Yekîtiya Ewropayê li hev civiyan. Di civînê de yek ji mijarên sereke jî nêzîkatî û gefên dewleta Tirkiyeyê bû. Li ser mijarê wezîrê karê derve yê Yewnanistanê Nîcos Dendîas da diyar kir ku di civînê de hewildanên dewleta Tirkiyeyê yên provokatîf mijara sereke ya civînê bûn.

Di heman civînê de hin hemleyên dewleta Tirkiyeyê yên mîna ji Rûsyayê kirîna fuzeyên S-400, êrîşkariya yekalî ya li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê, destwerdana şerê Qerabaxê û şandina eskerên Tirkiyeyê bo Lîbyayê di qada navneteweyî de ji aliyê welatên Yekîtiya Ewropayê ve zêde nayên pejirandin.

Her çiqas Erdogan di nav hewildanên nermkirina rewşa heyî de be jî, ev hewildanên heyî ji aliyê welatên Rojavayî ve têr nayên dîtin. Van hemleyan ku hişt dewleta Tirkiyeyê wisa bikeve rojevê bi xwe re li ser Tirkiyeyê barekî aboriyê yê giran jî anî. Bêguman ev dê li ser siyaset û baziarganiya derve jî bandorê bikin.

Dereng be jî dewleta Tirkiyeyê hewl dide ku krîza heyî çareser bike. Wisa diyar e ku bendewariya Amarîka û welatên Ewropa ji van hewildanan ew ku di serî de Erdogan, dewleta Tirkiyeyê dev ji nêzîkatiyên xwe yên hişk û teng berde.

Bi kurtasî dewleta Tirkiyeyê çawa ku li herêma Rojhilata Navîn êrîşî her deverê dike, talan û dagir dike, bi heman niyet û armancê xwest ku sînorê Yewnanistanê jî binpê bike, lê di vê dema borî de dît ku ne hêza wê ya dîplomasiyê û ne jî hêza wê ya leşkerî dest dide ku gefa li welatên rojava bixwe. Lewma niha hewl dide ku şaşitiyên xwe sererast bike.

# 'Nêzîkatiya CPT'ê cesaretê dide Tirkiyeyê'

**Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê (CPT) hefteya borî serdana Tirkiyeyê kir lê ligel tecrîda giran a li ser Ocalan neçû Îmraliyê**

Navenda Nûçeyan

Nêzîkatiyên Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê (CPT) yên li hemberî Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan bi awayekî xirabtir derdikevin holê. Wek tê zanîn ku CPT'ê herî dawî 28-29'ê nîsana 2016'an hevdîtin bi Abdullah Ocalan re kiribû û agahiyên hevdîtinê nehatibûn parvekirin. Piştî vê yekê CPT'ê 5'ê tebaxa 2020'an da zanîn ku sala 2019'an jî girtîgeha Îmraliyê ziyaret kirine lê şert û mercên 2016'an bi tu awayî nehatine guhertin. CPT ligel vê xemsariya Tirkiyeyê ya ku 21 sal in tecrîdê li ser Ocalan bi awayekî bênavber berdewam dike heta niha tu biryareke şênber nedaye û ev yek jî rê li ber Tirkiyeyê vedike ku tecrîdê girantir bike.

Hefteya borî CPT'ê li ser malpera xwe ya fermî ragihand ku di navbera 11-25'ê çileya 2021'ê de heyeta CPT'ê serdana Tirkiyeyê kiriye. Di dema serdanê de heyetê li gel rayedarên hikûmetê bi Komeleya Mafên Mirovan (ÎHD) û Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) re hevdîtin kirine. Lê heyetê serdana girtîgeha Îmraliyê ku tecrîdê lê berdewam dike, nekiriye.

Buroya Hiqûqê ya Asrînê jî der barê neçûna CPT'ê ya Îmraliyê de daxuyaniyek dabû û neçûna wê şermezar kiribû. Buroyê di daxuyaniyê de bal kişandibû ser girîngiya serdanên CPT'ê yên li Îmraliyê û diyar kiribû ku nêzîkatiya CPT'ê tê wateya domandina pergala îşkence û tecrîda li Îmraliyê.



Parêzera Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan Newroz Uysal têkildarî nêzîkayê CPT axivî û diyar kir ku CPT di mijara tecrîdê de cesaretê dide Tirkiyeyê.

**Her tişt bi zelalî li holê ye**

Newroz Uysal der barê serdanên CPT'ê ya yên peryodîk de da zanîn ku ev serdan di çerçoveya hiqûqî, mafên mirovan û rawestandina îşkenceyê de pêk tên û wiha got: "CPT'ê di serdana xwe ya dawî ya li Îmraliyê bal kişandibû ser binpêkirina hiqûqê û pergalê, ew wekî îşkenceyê nirxandibû û xwestibû şert û merc bên guhertin. Ji bo rakirina tecrîdê çend mukelefiyet li Tirkiyeyê ferz kirin, lê li hember vê yekê jî ji meha îlonê heta îro hevdîtina bi parêzer, malbat û wasî hatin astengkirin, mafê telefonê bi hinceta cezayên disîplînê hatin astengkirin. Dema her tişt wisa bi zelalî li holê ye jî CPT, piştî salek û 9 meh şûnde tespîta îşkenceyê kiribûn. Ligel vê îsal neçûn serdana Îmraliyê û ev tişt neyînî ye. Li gorî rapora ku demên borî weşandî tev negeriyaye."

**'Helwesta CPT ne cidî ye'**

Uysal di berdewama axaftina xwe de bal kişand ser hevdîtina CPT'ê ya bi rayedarên hikûmetê û ev tişt anî ziman: "CPT bi rayedarên hikûmetê hevdîtin kir lê belê neçû Îmraliyê. Peywira wê pêşîgirtina îşkenceyê ye, lê em dibînin ku şopandineke têr û tije ya CPT'ê tune ye û bandora wê ya guhertinê tune ye. Ji bo îşkence bê astengkirin hevdîtina bi rayedaran normal e. Lê belê tenê hevdîtina bi hikûmetê re nîşanî me dide ku bi helwesteke cidî CPT nêz nabe. Haya CPT'ê ji rewşa Îmraliyê, ji grevên birçîbûnê yên li girtîgehan heye. Tevî vê jî tenê bi rayedarên hikûmetê re hevdîtin kir. Ev helwest di heman demê de di mijara tecrîdê de cesaretê dide hikûmetê. Me gumana xwe ya di warê dayîna cesareta ji bo berdewamiya tecrîdê bi raya giştî re parve kir. Em ê bi CPT'ê re jî parve bikin."

**'Hemû dewletên endam berpirs in'**

Parêzera Ocalan Newroz Uysal destnîşan kir ku pêşîgirtina îşkenceyê hem peywira CPT hem jî ya dewletên endamên Konseya Ewropayê ne û wiha domand: "Divê CPT encamên vê pêvajoyê ji konseyê û ji Dadgeha Mafê Mirovan a endama konseyê ye ragihîne. Hemû dewletên endam ji vê yekê berpirs in. Li ser raporên komîteyê di heman demê li Meclisa Konseya Ewropayê jî hevdîtin çêdibe. Ya tê nirxandin an jî tê erêkirin. Raporên têkildarî serdana 2019'an jî li Meclisa Mayinde ya Konseya Ewropayê hat nirxandin û ji bo Tirkiye hewcedariyên vê raporê bîne cih bang hat kirin. Tevî vê raporê tecrîd bi dawî nebû. Hewcedariya vê raporê ne qedexeyên nû ne, divê tecrîd bi dawî bibe û hevdîtin bi malbat û parêzeran re pêk werin û îzolekirina di warê şerdên fizîkî de bi dawî bibin."

**'Em ê raporekê parve bikin'**

Her wiha Newroz Uysal destnîşan kir ku ew têkildarî rewşa li Îmraliyê CPT'ê her dem agahdar dikin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Em herî kêm ji sê mehan carekê raporê ji CPT'ê re dişînin. Em rû bi rû jî hevdîtinan dikin û ji bo bidawîkirina tecrîdê em bang dikin. Me têkildarî 'biryarên qedexeyê yên dadgeriya înfazê ya nû ya di îlonê de' jî îxbarnameya nivîskî ji CPT'ê re şand û ew agahdar kir. Me herî dawî 27'ê Nîsana 2020'an bi birêz Ocalan û muwekîlên xwe yên din re hevdîtin kir û piştre ev yek pêk nehat. Me ev jî bi CPT'ê re parve kir. Em ê di rojên pêş de jî têkildarî geşedanên hiqûqî û sedema serdana CPT'ê de raporekê bi CPT'ê re parve bikin."





Destar

Ehmed Pelda

# Mal û warê me, bela serê me

"Me, mala xwe li ser riya xelqê ava kiriye. Her kî tê bi malovaniya me têr nabe û çav berî mal û milkê me dide."

Belê kurtenivîsa dîroka me, hema ev e.

Wexta pêşiyên me ji heywanan cuda bûn û ji germahiya parzemîna Afrîkayê veqetiyan, cara pêşîn xwe li riya bakur girtin û gihandin herêma Mezrabotan û Zagrosan û ev herêm weke binemalekê bijartin. Ew roj ev roj e em li vir man, lê hin refên me neman û rêwitiya xwe dewam kirin. Berê xwe dan deverên cuda yên cîhanê. Hinekên wan di navbera çiya û tapên Zagros û Kafkasyayê re bi rê ketin çûn bakur, milekî wan jê fetilî û berê xwe da Sîbîryayê û di wir re gihîşt parzemîna Amerîkayê û ya din jî heyanî Skandinavyayê çûn. Li gor texmînan di wir re jî çûnûhatina Amerîkayê pêk hatiye. Her wiha çend milên din jî ref bi ref gihîştin Asyaya Navîn, Asyaya Başûr û heyanî parzemîna Okyanusyayê kişiyan. Jixwe derûdora Deryaya Spî ango deverên Ewropayê Anatoliya û bakurê Afrîkayê jî piştî kêliyeke demkurt weke xeta Mezrabotan û Zagrosan malovaniya şêniyên koçber kir.

Her refeke şêniyan li herêmeke cîhanê bi cih û war bû. Bi hezaran sal û zeman derbas kir. Her komeke civatê li herêmekê derfetên debarê û jiyanê ava kirin. Li gorî şert û mercên herêma xwe ezmûnan hîn bûn şaristanî, çand û rengê jiyaneke rêxistinî ava kir. Di ber re jî çûnûhatina kes û komên civatan çêdibû. Ji hêlekê ve ezmûnên xwe, zanîn û tecrûbeyên xwe parve dikirin, ji hêlekê ve jî desteseriya mal û milkên hev dikirin.

Her çiqas hîmê şaristaniyên cuda bi cuda di herêmên xwe de digiviriyan û hem jî hêla zêdebûna hejmara gel û hem jî ji hêla mezinbûna asta serweriya cih û warên lê ne zêde dibûn jî, têr nedikir û çav berî hev û hebûnên hev didan. Lewma pevçûnên navxweyî, şerên herêmî, zordestî, talan û şêlandin bû parçeyekî jiyana mirovahiyê.

Lêbelê herêma para me ketiye, ango em lê dijîn ne tenê îro, bi deh hezaran salan e bûye riya gelek civakên têreçûne; duçarî koçberiyê, êrîşan, zordestî û talanan bû û dibe. Li vê herêmê bi dehan şaristanî pêk hatin, lê her yek bi bedewiya xwe, bi şarezayiya xwe, bi dewlemendiya xwe têrnebû û negihîştin mirazê xwe. Hemû çavên hovan çûn ser heybeta wan a bêhempa. Yek bi yek bûn hedefa êrîşkarên hov û zordest.

Girê Mirazan, Heskîf, Newala Çorî, Çanda Xelef, Şaristanî û kulturên Mezrabotan, Gutî, Mîtanî, Sumer, Hîtît, Akad, Asûr, Urartu, Medya û bi sedan dewlet. Ma tenê ev? Nivîs, qanûn, dewlet, rêxistin, feylesofî û dîn û bawermendiyên bêdawî û qewî û her wekî vê bi sedan, bi hezaran dîtin, ray û raman, ezmûn û hînbûn pêk hatin.

Mixabin li ser vî erdî gelek netewe, gel û şaristanî binerd bûn. Tenê bi saya bermahiyên wan em ji hebûna wan haydar in. Bi taybetî neteweyên li navenda Mezrabotan ango li deştê yan jî binecih ji holê rabûn. Lê li teniştа wan, têkildarê wan li ser piya man. Wekî nijada samî kal û pîrên ereb û cihûyan, gava zordestiyek li hember wan pêk bihata û heke nikaribûyana xwe biparêzin, direviyan. Direviyan û bi hêştirên xwe, mal û hal û holên xwe bi lezgînî berhev dikirin û bi bayê bezê di nav çol û bestan de diqulibîn. Raza xweparastinê zeft kiribûn. Lewma heyanî roja îroyîn jî li ser piyan mane. Heke pirsgirekên navxweyî nebin, ji êrîşên derve ve tu zora wan naçe. Lê nerindiyên navxweyî jî bê hed û bê sînor in.

Cih û warên me, welatê me, axa me bênavber, di her kêliya dîrokê de, di her çerxa guherîna cîhanê de rastî êrîş û talanê hatiye. Ji xeta başûr, bakur, rojhilat û rojava, ango ji her çar alî ve riya leşker, êrîşkar, bazirganan û şênî û kesan e. Rêwî, bazirgan, karwan, gerok, sîxur, zana, keşe, mele di van riyan re bê sînor çûne û hatine, dane û standine, hîn bûne û hîn kirine, soz dane û soz girtine, pere dane, mal girtine, mal dane, pere girtine û bi vî teşeyî zengînî, zanatî dane zarokên cih û warê me û kal û bav, dê û pîrên me.

Çavnetêr çavsorî bûne, birçî û parsek bêstar mane, nezan û korezan bêhiş bûne, diz û dirûz bê feraset mane. Dadane li ser welatên kal û pîr û zar û zêrçan, wêran kirine, desteser kirine, talan kirine, kevir li ser kevir nehiştine. Gel ji ber neçariyê xwe avêtiye hembêza çiyayan, ketiye paşila gelî û şikeftan, xwezaya welat bûye dermanê xweparastinê ya bêhempa. Belê gava metirsiyek hebûye, êrîşek pêk hatiye tenê çend şivan, gavan û berxvanan karibûne semerên pêz, keriyên dewêr rakin, çend keç û xortan bi rêberiya mezin û rûspiyan mal bi barê hespan, keran, hêstiran hemû alav û amûrên malê bar bikin û xwe bigihînin cih û warên ewle ku xort jî parastina gel bikin. Bi kurt û kurmancî kurd li welatê xwe her gav koçber bûn.

Di zemanê asayî de jî koçberî dikirin. Vê carê jî havînê li ber germahiyê ji deştan ber bi çiya û zozanan, ji ber serma zivistanê jî ber bi germê û deştan koç dikirin. Li gorî çarçoveya vê jiyanê sewaldarî ji bo debarê derfeteke hêja bû. Malbat, eşîret ango sirsileta hezaran salî bi vê sayê ne ji welatê xwe dûr ket û ne jî bû bende û bindestê dijiminan. Her wiha bi çand, jiyan û zimanê xwe, bû civateke cihêreng û serwer. Xêncî xweparastinê bû êrîşkar jî. Bi taybetî civatên li deştê diman duçarî êrîş û talanan dihatin, gelek bazirganên ku heqê rê ji bo derbasbûna di sînorê eşîrê re nedin dihatin şêlandin. Bajar û gundên deştê xwe dorpêçkirî dihesibandin û her gav di nav metirsiyê de bûn.

Bi modernîzmê, bi dewletbûnê û bi pêşketina teknolojiyê re rewşa kurdan bêhtir xera bû. Potansiyela deşt û çiyayan ya çandiniyê û sewalvaniyê xwezî û mehdeyê dewletên çavbirçî zêde dikir. Sewze, fêkî, adan, goşt, hirî, pembo ji bo çerxa pîşesaziyê weke berhemên berdest ên xav bûn. Li welêt ev berheman dihatin berhevkirin, di karxaneyan de li gorî pêdiviyan dihate çêkirin, pêçandin, barkirin ji bo firotana bajarên welatên serdestan.

Dîsa çiya û banî, erd û axa kurdan di navbera Qefqasya, Rojavayê Asyayê, çol û bestên ereban, Deryaya Spî, Deryaya Reş û Deryaya Hezarê de herêmeke jeostratejîk e. Kî li çiya, zozan, gelî, newal û deştên kurdan bi cih bibe li herêmê jî dibe hêza serdest. Lewma rom, pers, tûran, osmanî, sasanî, rûs, ereb, îngilîz, frensî, alman, tirk, îranî û hwd. çav berî vê axê dane. Her wiha çemê Mûradê, Erez, Firat, Dîcle û Zap û gelek çavkanî ji bo avê û avdaniyê, ceyranê bûn kanên bêhempa.

Xwezî tenê ev bûya. Wêraniya herî giran hebûna qîra reş e. Petrola bêbinî, zengîn, kalîteya xas û derxistina hêsa li welatê me bû bela serê me. Li welatê dereke, şêniyên ji me dûr pîşesaziya xwe bi pêş xistin, lê enerjiya wê li ba me ye. Bivê nevê çav berî herêma me dan. Dixwaze bi dil, dixwaze bê dil be, destdirêjî kirin. Ji bo destxistina zêrê reş, ne ji me re pergal hiştin, ne feyde dan, ne jî rê dan em bi hêz û taqeta xwe li ser piyan bimînin. Bi hemû hêza xwe cerd rakirin, bi topan, tangan, balafiran, sedhezeran leşkeran hêwirze anîn li ser axa me û talan kirin. Ew roj ev roj e, destê wan di nav pêsîra me de ye. Mehremiyet, sinc û ehlaq nehiştin. Bi postalên xwe, welatê me jî, civata me jî herimandin, wêran û parçe kirin û ne tenê şerê me, şerê hev jî li ser axa me kirin.

Em bêtaqet man. Ji xwe ve çûn. Ji çiyayan vekişiyan. Wekî ji paşila dayika xwe derketin û tehrê sêwiyan bûn bendeyên bajaran, lê bajar ne bajarên me bûn. Bi hazirî di destê neyaran de bi pergala wan em neçarî xwe kirin. Ne çand, ne ziman, ne zanîna me serbest û azad e. Bi asîmîlasyonê hişê me tê tevizandin, ruh û canê me tê xurufandin û wexta ku em hişyar dibin, dibînin ku em ne em in. Bi vî halî, sed hezar heyf e, ku her kes li welatê me xwedî derdikeve û xêncî me.

Belê divê em hişyar bin, ji xewa mirinê rabin, bi berxwedêran re hevalbend bin.

# Avakirina ruhê yekitiya neteweyî

Hisên Çatikkaş

Pirsgirêkên kurdan ên naxweyî, tişta xuya dibe, bi qasî dîroka kurdan kevin in. Ewqas kevin in ku xwe di zimanê kurdan de jî bi awayekî berbiçav nîşanî me didin. Weke travmayê her carê derdikevin pêşiya me. Em çîrok û metnên nivîskî bidin aliyekî, tenê bala xwe bidin gotinên pêşiyan, em ê vê yekê bibînin. Çend ji wan gotinan bi vî awayî ne: “kurmê darê ne ji darê be, dar narize”, “giyayê hewşê tehl e”, “kurd jî weke kewên gozel dijminê qewmê xwe ne”, “kurd nabin yek”, “dinya hemû dijminê kurdan e, em kurd jî dijminên hev in”, “em nebin yek, em ê herin yek bi yek”... gotinên bi vî awayî xwedî bandoreke mezin in. Meriv dikare bibêje ku ev gotin rê li ber çareserkirina pirsgirêkan digirin. Lewra dema meriv bixwaze ji derûniya civakekê fêm bike, meriv dikare berê xwe bide zimanê wan. Ji ber ku ziman jî weke civakê zindî ye, pirsgirêkên civakê di nav xwe de dihewîne. Ji ber van tiştan, min xwest berê xwe bidim pirsgirêkên naxweyî.

Van salên dawî, dinya bi awayekî lez û bez diguhere. Ji ber guhertina a li dinyayê, di nav kurdan de jî guherînên mezin çêdibin û derfetên mezin dikevin destên kurdan, lê mixabin em kurd nikarin van derfetan bi kar bînin. Helbet sedemên vê yekê pir in. Heta salekê em dikarin qala van sedeman bikin, lê hewceyê vê yekê nake, lewma em ê bi du awayan li ser sedeman bisekinin. A yekê sedemên navneteweyî ne ku ji parçekirina Kurdistanê ya di nav çar dewletan de bigirin, heta digihîje rol û misyona hêzên global a li ser kontrolkirina heremê. A duduyan jî sedemên naxweyî yên kurdan e. Helbet her du sedem jî bandorê bandorê li hev dikin. Parçekirina Kurdistanê ya ji hêla hêzên global ve bandoreke mezin li parçekirina hiş û mejiyê me jî kiriye ku hê em behsa birakujî yan jî avakirina yekitiya kurdan dikin!

Netewebûn û yekitî du tiştên di nav hev de ne ango her du hevdu dihewînin. Heke em qala netewebûna neteweyekê bikin, wê demê pirsgirêka wê neteweyê ya yekitiyê tune ye. Bi kurt û kurmancî heke li devera netewebûn hebe, yekitî jî heye. Li devera netewebûn nebe yekitî jî tune ye. Netewebûna kurdan wê bi xwe re deskeftiyên mezin bîne ku me bi serê çavên xwe di dema berxwedana Kobanê de dît. Dibe ku cara ewil e di dîroka Kurdistanê de hemû kurdan mil da hev ji bo xwe şer kirin. Bakur û Başûr mil dan hev û barbarên sedsala 21’ê tevî hevalbendên wan têk birin. Kobanê nîşanî me û dinyayê da ku kurd bibin netewe, Kurdistana azad û serbixwe nêzîk e, ne dûr e. Lewma bi taybetî dagirkerên welêt xwe li vê yekê negirtin, ji bo tifaq û yekitiya kurdan xira bikin, çi ji wan hat kirin û hê jî dikin. Li vir hewce ye ku em kurd çend pirsan ji xwe bikin; em li Kobanê çawa bûn netewe? Ew ruhê ku li Kobanê ava bû, çawa xira bû? Yên bûn sedema xirakirina ruhê Kobanê kî bûn? Werhasil ev xal zêde ne û lewma bi nivîsekê em nikarin çareser bikin. Bi kurtasî meriv dikare bibêje, kurdan ew ruh ava kir lê xêrnexwazên kurdan ew ruh xira kir. Lewma çavên deriyan xwelî seriyan!

Dema mesele dibe yekitiya kurdan, yekser em hincetan derdixin. Ewilî em hevdu sûcdar dikin û piştre jî neletê li dagirkeran dibarînin, li gorî baweriya min divê kurdên azadîxwaz kumê xwe deynin ber xwe, bêyî ku hawarê bigihînin derdorê, guh bidin ser wijdanê xwe û li rewşa neteweya xwe meyzîne. Heke ji birakujiyê, bêstatûbûna welêt, ji kuştina kurdan acis nebe wê demê bila bi heman awayî jiyana xwe bidomîne, lê heke wijdan acis bibe, divê teqez ji bo guherîna vê rewşê, ji kesên pêşengên kurdan bixwazin da ku vê rewşa kambax bê guhertin. Baş e, ev divê çawa be?

Em kurd ji çalakiyan hez dikin. Li hemberî dewletan em her tim têdikoşin, lê mixabin ev têkoşîna me ya li hemberî dagirkeran heta niha tenê li Kobanê û şerê li hember DAIŞ’ê yê li Başûr hevpar bûye. Lewma êdî hewce ye, em berê çalakiyên xwe bidin xwe. Fîlozof Marx dibêje: “Fîlozofan cîhan tenê bi hinek awayan şîrove kirine, lê di rastiyê de pirsgirêk guhertina wê ye.” Heke em li şûna fîlozof kurd û li şûna cîhanê jî Kurdistan binivîsin wê rewşa me bi zelalî bê dîtin.

Rola mezin a rewşenbîr, hunermend, çapemenî û nivîskarên kurd e. Ji bo vê divê çalak bin û her roj çalak bin. Helbet divê çalakiyên xwe li hemberî rêxistinên kurdan wek çalakiyên bêîtaetiya sivîl pêk bînin. Wek mînak sed hunermendên kurd ji her aliyê Kurdistanê, Ewropa û dinyayê berê xwe bidin Başûr, li pêşiya keleha Hewlêrê ‘konê yekitiyê’ vedin û bêjin heta nûnerên hemû rêxistinên kurdan soza yekitiyê nedin, em ji vir naçin. An jî du sed nivîskarên kurd li Kobanê di bin peykerê Arîn Mîrxan de li ser xalên bingehîn ên yekitiyê ‘nameyên yekitiyê’ binivîsin, ji serok û partiyên kurdî re bişînin. Tevahiya çapemeniya kurdan tenê behsa van çalakiyan bike û tu alternatîfê nehêle ji kesên xêrnexwaz re. Çalakiyên bi vî awayî dikarin rê li ber guherînên mezin vekin. Tenê bi konsereke li Ewropayê, bi serdanên hêzên siyasî yan jî bi nivîsên di blog û kuncikên xwe yên rojnameyan de kes dê nikaribe pêşiyê li rewşa me bigere.

Dibe ku gelek kes bibêjin; “Sed hunermend an jî du sed nivîskar wê çawa vê rewşa dîrokî biguherînin?” Bersiva vê pirsê di nav rûpelên dîrokê de veşartî ye. Çalakiya Rosa Parks bû sedem ku di rewşa reşikan de guherînên pir mezin çêbibin. Çalakiyên Gandhî li Afrîkayê bûn sedem hind gelek mafan werbigirin û li Hindistanê jî dawî li dagirkeriya îngilîzan were. Weke encam divê êdî em dev ji gotinan berdin, ji bo guherîn û deskeftiyên xwe berê xwe bidin xwe!




# Melekên xirab an mirovên xirab?

Newaf Mîro

Di qewl û felsefeya êzî de, qencî û xirabî ji yek navendê tên.

Xwedê bê şirîk û heval e.

Mirov ji axê çêbûne, wê bibin ax.

Mirov nabin şirîkê Xwedê.

Dinya milkê Xwedê ye.

Ezazîl berî mirovan hebû, Xwedê berê ji durê gerdûn, Adem û hemû xulyaqet afirandine. Adem ji axê çêbûye û pêwîst bû bibe ax. Derketina wî ya ji bihuştê pêwîstiyek bû. Helbet ji surê, nûrê, yan ji stêrkan xuliqiye û berê dinya hemî av bûye. Teoriya "Big Bang"ê jî hema nêzîkî heman babetê ye.

Ezazîl erka xwe pêk anî, ji axê Adem afirand û ruh berda bedena wî, bi dengê muzîkê, di qewlê êzî de dibêje; li ber dengê def û şibêbê ruh ketiye bedena Adem. Lewma def, şibêb û muzîk beşeke grîng e di sema û ayînê êzîdiyan e.

Jixwe nedibû ku mirov tiştê bi destê xwe afirandiye, ebadeta wî bike. Weke dayik û bav, ebadeta zarokên xwe bikin. Helbet her olê li gorî feraseta xwe û ji aliyê xwe ve şîrove kiriye.

Heft milyaket, heft roj, heft reng, afirandina bi gerdûnê re, heft tebeqe erd/gerstêrk, heft parzemîn, heft pênasînên xwedênasiyê, roj/şems, hîv, stêrk, ar, agir, ax, av û nan e. Helbet wateya hejmara çil jî heye û cuda ye.

Di vir de pirs ev e; yê xirab milyaket/xwedawend in, yan mirov in, ango ademperest in?

Ademperestî çiqas xwedênasî ye? Yê mirov û jiyan afirandine, yan yê xwe xwediyê her tiştî dibîne û heq şandiye ezmên?

Li gorî baweriya herî kevnar a êzdatiyê, her tiştê li ser rûyê erdê, yê tê dîtin û nayê dîtin, nîşaneya Xwedê ye. Lewma her divê weke mirov ji Xwedê re rêzê bigire, ji kes û nîşanên heyî re rêzê bigire. Nabe mirovên ji axê çêbûne bibin şirîkên Xwedê. Ew dikarin bibin nîşane û diyardeyek ji bo Xwedê, lê nabin şirîkê Xwedê û ew jî weke hemû mirovan bi mirinê xilas dibin.

Ola êzdatiyî miletê xwe berî miletê Hewa û Adem dibîne, ew xwe miletê Tawisî Melek dibînin lê olên din ên piştî ola êzî hatine, wisa nabînin.


Ademperestan bi navê Îblîs û Melek, ruh û mirovê xirab, êrîşî xak, ol û miletê din kirine. Ango ew têgeheke misyonertiyê ye. Mebest dagirkirin û tunekirina hêzên din e. Ademperestî bingeha bavsalariyê ye jî. Bi bavsalariyê re mêr hatiye pîrozkirin. Lewma em dibînin, qala sed û bîst û pênc hezar peyamneran dibe, lê hemû mêr in.

Weke Zerdeşt bixwe her tiştê xwe ji ola êzdiyan girtiye û bixwe êzîdî bûye, lê bûye ola serdest a şahên faris. Bi navê du xwedawendan; Ewraezda-Aûramazda, yan Exirîman/Ehrîman şerê mirov û olên din kirine.

Cihû xwe qewmê Mûsa pêxember dibînin. Xiristiyanan bi heman babetê li ser navê Xwedawend, ruh, cîn û mirovên "xirab" xirabî bi xelk û miletê din kirine. Împaratoriya Romayê berê şerê Mesîhiyan kiriye, paşê bi navê Îsa, êrîşên xaçperest birine ser mirovên din, ji Ewropa, Asya, Afrîka û heta bi Amerîkayê.

Ola îslamê heman babet domandiye. Bi navê Xwedê şerê medeniyet û olan kiriye, di bin navê, kufarê de. Xwedawendê xirabiyê û tirsê afirandine di hişmendiya xwe de.

Olên berî peyamnêr û mirov/mêrê "pîroz" oldar xizmetkar û dewa bûm ji bo her pirsê û derdî. Bi qasî ku xizmeta mirovan dikirin, ew qas nêzîkî Xwedê dibûn. Ji bo mirov biketa rêza xas û ewliya pêwîst bû, mirov xwe ji kêf, berjewendî û ji mal û milkê dinyê qut bike. Dinyê weke mala xwe bibîne, miletê xwe weke bav, dê, xwişk û birayê xwe bibîne. Çavê mirov ne di mal û namûsa xelkê de be. Mal û milk ji bo dinyayê ye, divê bawermend li ebediyatê bigere.



Gava xerqê reş li xwe bikirana êdî ev dinya mala wan û ew jî xizmetkarê olê û civakê bûn. Şîn, şahî û ayînê wan de beşdar bû. Duhakar, lavekar û xizmetkarê milet û rêya heq û xwedênasiyê bû. Xwedê ne yek, hezar û yek, ji hezar û yekî, her yek bû. Ola êzdayetiyê ya Baba Dewrêş, ya xefûrên serê rêyan û ya qencî û xilmeta mirovan bû. Ew oldarên êzî, çavê wan ne di mal û textê dinyayê bû, ew tiştekî tenê ji bo vê dinyayê û ne jî bo ebediyetê bû. Armanc ruh/giyanekî bêbiha û dem bû. Çendîn miletê wan di nav xêrê de bijiya û dinya di nav aştiyê de ba, miletê wan dikarî bêtirs bijî û razêyî. Aştî û bereket bixwe nîşaneya Xwedê bû. Oldar, xas, qelenderên êzîdî, ji hemû kesî bêhtir xizmetkar û xîretkêşên ol û miletê xwe bûn.

Di baweriya êzî de, her tişt çilê wî heye, çilê jiyanê û wisa jî yê destpêka havîna germ û zivistana sar... Oldarên êzî, di çileyan de bi rojî bûn. Helbet rojî, bi ronkaya rojê ve tê zanîn û di êzdatiyê de roj weke hebûna Xwedê, ar nîşana jiyanê û hebûnê ye. Oldarên êzî ne aliyê şerê navxweyî bûn. Ew her aştîxwaz û xêrxwaz bûn, xwedî ruhekî pak, gotineke pak û lewma bavçak bûn.

Bi derketina peymanêran re, ew ruhpakî bi cureyekî ji aliyê hêzan ve hatiye bikaranîn. Gava ku mirova dîtiye bi navê olê, ruhpakî û gotinê dikare zûtir bigihe armanca xwe ya sereke, pêxemberên qral û padîşahan bixwe şerê wan dikirin, ew hebandine û kirine ola fermî. Bi navê xwe mabetên herî mezin ava kirine û navê Xwedê û dîn, kuştin pîroz û ferz kirine. Xwedê şandin ezman û erd ji bo xwe hiştin. Xwe kirine şûna Xwedê, berdevkê Xwedê, qewm û lawên Xwedê. Dewleta Xwedê, miletê Xwedê û zimanê Xwedê. Tevî ku Xwedê, xwedî û afirînerê her zindî, sinc û nehatiye. Her tişt bixwe nîşaneya Xwedayê kamil û temam e.

Bi pîrozkirina mirov re, ango serdestiya olê re, yan misyonertiya olê û peyamneran re, jin êdî bûbû milkê mêr û mêr pîroz dikin. Lewma hemû pêxember nêr/mêr in. Êdî serdem ne ya afirîner, ya jêder e. Êdî dema mêr û mirov bû, mirov bû ruhber û hebûna herî pîroz. Mirov xwe kiribû Xwedayê erdê, ezman jî dabû Xwedê. Êdî hêz û qewet pîroz bû. Ew dema pêxember, qral, padîşah û siltanan bû. Ew jî hemû nêr bûn. Rêz ne ji her zindî û sincî re dihate girtin, ji qewm, ol, ziman û miletê qralan re dihate girtin. Tac û textê wan ji nûra Xwedê bûn.

Helbet hemû ol û baweriyan berê û heta niha jî, ku ne zêde cuda ye, yên li hemberî û tiştên zêdeyî zanîna wan e, bi navê ruhê xirab, cîn, pîrhebok, fêlbaz, xapînok, kufar, xwînrij, xwînvexwir, zarokkuj, zinêkar, genî, bidûvik, xayîn, zindiq û heta roja me bi peyva terorîst pênase dikin.

Ev nav û pênase bûne kiras û kefenê kuştin, reşkirin û tunekirinê. Mirovan rêya xwe ji ya Xwedê, heq û xwezayê ferztir dît û her tişt ji bo mayîna xwe bi kar anîn û tînin.

Helbet jiyan bixwe têkoşîna hebûn û tunebûnê ye. Divê her kes û milet çawa xêra xwe, miletê xwe, wisa jî ya miletê din jî bixwaze. Hizra pêkvejiyanê hizreke aştîxwaz e, lê divê berî her tiştî qurm û nêrîna xwe ya avaker biparêze û weke karê rojane bike. Xêrxwazî di ruhekî pak de ye, ne di bedeneke pak de. Pîrê pak, ruhê pak e. Ruhê pak bêmirin e.

Di duhayên êzîdiyan de dibêje; ya Xweda, tu li heftê û du miletan bêyî rehmê; serê ser belgiya, girtiyê hebsan; rêwiyên riyan, kesîb, belengaz û êsîran û me jî pêra. Em kêmin Xwedê temam e.

# Ma mar mijikan rê firsend nêdî



Av. Cemile Turhalli

Dinya bê awe dinya nîya. Awe semedê dinya muhim a. Xoza awe ra ameya. Cuye awe ra ameya, merdimîye zî. ¾ î dinya û 2/3î leşa merdime/î aw a. Awe tena ya. Awe pê destê merdiman nêvirazîyena û alternatîfê aye zî çin o.

Merdimîye xo nêweşî ra pê awe pawena. Awe înan rê tena cuye nêarda. Înan rê cebîr, fîzîk, her ca ra zanist, mîtolojî û medenîyet zî xo reyde ardo.

Zereyê dinya de cuye, 1,2 mîlyar vere cûyan pê awe dest pê kerde. O çax heme ekosîsteme xo bedilna. Bedilnayîşê na cuya rêzile de awe hertim estbî. Formanê bînan yê cuye de awe qet kêm nêbî. Na ekosîsteme de emrê modern merdiman zî mabênê 150.000-200.000î yo. Emrê merdime/î goreyê emrê dinya sey yewî nuqta ya. La çîyêk bîn zî esto. Na nuqta felaketê dinya û felaketê merdimîye xo ra ana.

1,2 mîlyar serre badê pê dinyaya nikayînî de awe kêm bîya. Dinya de merdim, heta nika semedê dinya tehdît nêbîyo. Merdim semedê dinya, semedê xoza, semedê xo nika bîyo tehdîtêko pîl.

Nê hirê sey serran de sîstema kapîtalîste, teknolojî ser o awan bî. Pê teknolojîyê xo kedwerîye pîl kerde. Wayirê teknolojî, yanî şîrketê patronan, çimeyanê dinya girewtê destê xo. Waştêne nê çimeyan ra pere qezenç bikerî. Semedê pereameyîşî wextêk lazim bi dewletan ser o herb vet. Armancê nê dewletan semedê merdimîye nêbi, semedê patronanê sanayî bi. Xora ne dewlete patronanê sanayî ra fek vera dana ne zî patronê sanayî dewlete ra benî. Patronê sanayî çend kar bikerî hende baş o. Kar sebebê sîstema înan bi. Îdeolojîya xo ser o demokrasî awan kerd. Dewletê kapitalîstî Afrîka ra bigîrî heta qitaya Amerîka işqal kerdî. Înan rê vatêne ma şima rê medenîyet anî. Şarî ra va, ma şima rê rehetî û azadîye anî. La raştî wina nêbî. Vera vera na sîsteme eşkere bî. Vejîya orte ke na sîsteme nameyê demokrasî ser o merdiman rê koleyîya moderne ana.

Na sîsteme vatêne mulkîyeto xususî semedê merdiman baş o û mutlak o. Lâbelê tewr vernî de erdê merdiman işqal kerd. Otorîteya xo bi zorîye ser o ard qebulkerdiş. Erdê înan de înan kerd karkerê xo. Merdimî verê cû semedê xo yan zî semedê beganê feodalan şixulîyayêne, nika zî bîyî karkerê şirkete û dewletanê kolonyalîstan. Serê sibayî ra hetan şewe merdimî şixulîyayêne. Çi semed? Semedê ke tena nêmirî. Şixulnayîşê înan ra patronî zêde ra bîyî dewlemend, merdimî zî zêde ra bîyî feqîr.

La sîstema patronan de patronî çend qezenç kenî hona zî qet mird nêbenî. Pîzeyê înan de qulike esta û se mar mijikî sipenî sipenî û badê pê her çîyî kenî ziwa. Semedê înan mirdîye çin a.

Nê patronê şîrketan çim fînenî her çîyî. Çend kar bikerî hende înan rê baş o. Peynî de se beno, se nêbeno muhîm nîyo.

Nê şirketanî, warê cayê merdiman de fabrîqa nenî ro. Se sîyanûre, kîmyasalan erzenî zereyê erdî. Jehrê fabrîqayan erzenî çem û behran, dumanê kîmyasalî zî veradanî xoza. Gege vernîya awa çeman genî Santralê Hîdroelektrîkî (HES) virazênî û habîtat bedilnenî. Xoza talan kenî û ekosîstema cuya heminan vinî kenî.

Behrî ra vêşêr, çimeyê awa dinyaye çeman ra vila benî erd. Çemî damara xoza yî. Dinya ser o, goreba xo rehet gêrenî. No gêrayîş ganîyîye dano xoza. No gêrayîş semedê tewir-cuye zaf muhîm o. Çimkî ganîyîye pê gêrayîşê awe vila bena û zêde bena.

Sîstema patronan pê awa xoza karê xo zêde kena. Vernîya awa çeman semedê barajan gênî. Tena vernîya awe nêgenî. Vernîya daran, vernîya zerqitan, vernîyan mîlçikan, vernîya milyon tewir-cuye gênî. No hal, mîkroorganîzmaya erdan heminan rê tesîr keno.

Dinya de mîlyon serre de tewircuye xoza de virazîyaya. La aseno ke çend serre de nê milyon tewir-cuye qet nêmaneno, qir beno. Hirsê pereyî emrê dinya, emrê xoza pûç keno, vinî keno û mirêneno.

Na aşme de datê mi telefon kerd. Mi ra va “Dewa ma de baraj virazenî.” Mi va “senî virazenî? Dewa ma goreba barajan nîya HES qet nêbeno. Va na hewe Hidroelektrik Santral nêvirazenî. Tewr vernî, verniya çem û dereyî gênî, borîyan kenî zereyê erdî û awe zereyê borîyan ra benî. Nê borîyan ra awe veradanî, ceyran virazenî. Badê pê na awe zî reaksîyon nawnena û bena jehr. Ferqê bînan ra na awe semedê xoza bena jehr.” Mi va “Çi semed wina kenî?”. Va, “semedê mesrefî kêm bibo seba ney kenî.”

Şima vînenî, semedê patronê şîrketan kar her çîyî ra muhîm o û meqbul o. Qirika înan ra pere şino labelê qirika ma ra zî jehr şono war. Înan heme xoza talan kenî ekosisteme mirênenî û ma zî keyeyê xo ra vejenî ma kenî koçber.

Ma zanî ke, awe tena yê merdiman nîya. Awe heqê xoza ya. Halbuke dewlete rayberîya awe, nameyê xoza û komelî gêna xo ser. Nika zî awe xoza ra û komelî ra gêna, diznena patronan rê roşena. Patronî zî hukumet û dewletan rê paşt danî.

Ma gere heqê xoza û heqê komelî nedî dewlete. Dewlete hertim neheqîyan ra xo pîl kerda. Dewlete heta nika komelî pîl nêkerda, hertim tena firsend dayo grûbêka biimtîyaze.

Vîrê ma de wa no bibo! Ma nêveradenî awa ma tonikê/qasayê şirketan wa dekera. Çemê ma damara xoza yê. Qederê merdimî/e, se gerayîşî aw a. Vernîya çemanê ma girewtiş, qirkerdişê ganîyî û merdimîye ya. Ma nêveradenî damaranê ma ra gonîya ma bigîrî. Gere ma nêveradî, mar mijik wa ma bisepo ziwa bikero.





## Ben û Sen de rijnayîş dewam keno

Taxa Ben û Senî ya Amedî kewena binê sûran û tede welatijê feqîrî cuyenê. Serê her keyeyêk mabenê 40 û 100 hezarî de pere yeno dayene ke razîyê rijnayîşê keyeyanê xo bibî. Welatijê taxe vanê ke bi no pereyî keyeyêk nîno herînayene û taxe de rijnayîş dewam keno. Welatijî reaksîyonanê xo ardî ziwan û selahîyetdaran ra persayî: “Şarê tîya do şêro ça? Qasê ke keyeyêk bêro herînayene pere nîno dayene û şar do tîya ra bivejîyo reyna şêro koxban.”
***AMED***



## Şar serdê zimistanî de konteyniran de maneno

Xarpêt de 24ê çeleyê 2020î de merkezê ci Sîvrîce bi girdîya 4.8î de erdlerz virazîyabî. Erdlerz de 41 welatijî merdî û 1607 kesî zî birîndan biyî. Erdlerz de 10 hezarî ra zêde awanîyî xisar dîyî û ame vatene ke do 26 konutî bêrî viraştene, la heta nika tena 2 hezar û 500 konutî teslîmê welatijan bîyî. Serê erdlerzî ra serrîyêk derbaz bî û şar serdê zimistanî de konteyniran de maneno. Welatijê Xarpêtî dîyar kerdê ke mexdurê erdlerzî ya kîra de manenê, ya zî konteyniran de cuyenê. Ame vatene ke serdê zimistanî de mendişê konteyniran hîna zerhmet o û veng dayî selahîyetdaran ke mexdurîyetê şarî ser o bêro vindetene. ***XARPÊT***



## Qezayê Çewlîgî binê vewre de mendî

Merkez û qezayê Çewlîgî binê vewre de vindî bîyî. Vewre 10 santîmî vîyarna û varayîşo zêde vera ge-ge rayîrî padîyenê. Qezayê Kanîreş û Bongilan yê ke cayê berzî de yî û varayîş zêde herînenê de badê çend rojan reyna varayîşê vewre dest pêkerd û varayîş dîmenanê kartpostalinan vet werte. Çendêk verê cû Mudirîya Pêroyî ya Meteorolojî zî semedê bajaranê Herêma Anadolîya Rojhelatî îqazê vewrêsî kerdbî. Çewlîg bi 274 hedîseyan cayo tewr rîskin ê vewrêsî de yo.
***ÇEWLÎG***





## Cemxaneyê Duzgun Babayî bernameyê xo eşkera kerd

Dêrsim de menga Xizirî bi rojeyan û rîtuelanê bawerîye dewam kena. Mega Xizirî de loqmeyî yenê vilakerdene, şar şinê jîyargeyan û turbeyan û waştişê holî yenê kerdene. Reyna na menge de cemî yenê girêdayene, qurbanî yenê serebirnayene û rojeyî yenê girewtene. Cemxaneyê Duzgun Babayî bernameyê xo yê Xizirî eşkera kerd. Goreyê bername do 4ê sibate de saet 11.00î de şar Cemxaneyê Duzgun Babayî de arê bibo û şêro Duzgun Baba. Ewja de zî do aktîvîteyî bêrî viraştene.

# Kerdeneyê 1990î dewre de yî


Bajaranê cîya cîyayan ê Tirkîya de hertim berê elewîyan yenê nîşankerdene. Ber û dêsanê înan ser de mesajê kiştiş û tehdîtkerdişî yenê nuştene. Nê hedîseyan ra yew zî çendêk verê cû Yalova de ame cuyayene. Kuçeyê Lokmanî yê mehleya Baglarbaşî ya Yalova de berê 5 keyeyanê elewîyan ameyî nîşankerdene. Serdozgerîya Komare ya Yalova badê hedîseyî eşkerayî dabî û da zanayene ke derheqê hedîseyî de tehqîqat dîyayo destpêkerdene. Hedîse ra dima elewîyê ke berê înan ameyî nîşankerdene dîyar kerdê ke nê kerdeneyan vera ê şikin ê û qetlîyamê ke verê cû vera elewîyan de virazîyayê yenê vîrê merdimî. Welatîyo ke berê ci ame nîşankerdene Hasan Arduç, pîrê elewîyan Alî Îhsan Gultekîn û Serekê Weqfa Kulturî ya Haci Bektaş Velîyî yê Yalova Fîkret Demîrî derheqê kerdeneyan de qisey kerdî.

Arduç ke berê ci ame nîşankerdene qiseykerdişê xo de va: “Eke komel bêro antene do hedîseyê tersin bêrî cuyayene. Meseleyêk ma tu kesêk reyde çin a. Kesê ke wina kesê wazenê provakasyonî virazîyê.”

Pîrê elewîyan Gultekînî da zanayene ke reya yewino ke taxa înan de û sarê dêsanê keyeyê înan de çîyêko winasî virazîyeno. Gultekînî dîyar kerd ke ê hedîseyî ra dima hayîya qereqolî pê hesnayî û çarçeweya hedîseyî de îfade înan ameyo girewtene.

Demîrî ard ziwan ke 5 ra zêde keyeyî ameyî nîşankerdene û Qetlîyamanê Sêwaz, Mereş û Çorumî ard vîr û va: “Kesê ke dêsean ser de nuşteyan nuşî ganî bêrî cakerdene. No hedîse ma nêdejna. Badê hedîseyî xeylê rêxistinanê sivîl û komelkî ra mesajê paştdayîşî ma rê ameyî. Wazenê kerdeneyanê 80-90an bikerê dewre. Osmanîyan ra nata elewîyî polîtîkayanê asîmîlasyonî reyde rî bi rî mendî. 30 serran de 27 reye keyeyê ma ame nîşankerdene. La ma qet nêdî ke kesêk ame cezakerdene. Qetlîyamanê Sêwaz, Mereş û Çorumî de zî kesêk nêame cezakerdene. Ma waye û biratîya şaran wazenê. Serdemê modern de kerdişê winasî merdiman dejnenê.”
***YALOVA***






# Tiştanok (mamik)



**1-** Mamê Mino mamanî
Qesra spî bê derî
Kî dizane ev çi ye?

**2-** Tiştek min heye
Bi şev bûk e
Bi şev pepûk e
Hûn dizanin ev çi ye?

**3-** Tiştek min heye
Bûka mîrê Hesena
Kumê Hûtik
Tijî nûtik
Ev çi ye gelo?

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we bin. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**
**1- Hêk 2- Lembe, çira 3- Hejîr**

# Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re parve bikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.


→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Şivên Sofî Sîso şeş in**

→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Konê me bi qîra we ve**
**Qîra we bi konê me ve**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
**Darê min qul darê bavê min qul**
**Darê min di qula darê bavê min de**



# XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

1. Sîleh, amûrên şer 3. Heywaneke bisaw û jehriya wî dijware
5. Sotemenî, qirş û qalên şewatê 6. Ji bo kesên ku bi rêyekê ve diçe tê gotin
7. Pêşengekî olî yê civakê 9. Jornivîs
12. Dema dibare bi xwe re cemedê tîne 14. Yek ji rojên taybet ên pîroz
15. Zelzele, lerza erdê 17. Xwedayekî misrî
18. Rojeke hefteyê 22. Hevsera qral

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Hejmarek
2. Cihê ku mêş tê de hingiv çêdikin
3. Pirç, tayekî por
4. Dirb, cihê ku mirov lê dimeşin
5. Rivîn, gurbûna agir, pêt
7. Avî, xunav 8. Qencî
10. Zemîn, ax
11. Meheke biharê
13. Şerm 14. Zimanekî samî
16. Lêdan, lêxistin
19. Dar an jî hesinê ku didine ser stûyê ga û gamêşan da ku erebeyê yan jî cotî bikêşin
20. Kul, keser, derd
21. Fêkiyekî havînê
23. Agir

Bersiva hefteya borî





Kewê Redkan

# Çîroka bûka bedew

Min heta niha di vî emrê xwe de bûkek wisa bedew nedîtiye, bê merûmê hema xwedê qelema xwe li ser te xêz kiriye gelo? Lê dayê, meriv ewqas jî bedew nabeee!

Wan deman ez hê jî teze dibûm qîzeke xama. Lê hemû derd û kulên min bi dîtina bûka mala xalê diya min bû. Hema min çavên xwe ji xew vedikir û ez direviyam diçûm ser kaniya orta gund, li bendê disekinîm ka bûka mala xalê diya min, Sefure wê kengî were ser kaniyê!

Min navê xalê diya xwe nizanibû, qet nedifikirîm jî ji diya xwe pirs bikim, navê xalê wê çi ye! Nizanim çima, ez li ser vê mesela bedewbûna di nav malabata diya min de pir difikirîm.

Min xwe bi xwe digot; hemû jinên mala bavê diya min bedew in, lê ez çima wek wana wisa ne bedew im? Çima ez wisa yeke bejinkinik, jar û qurçomekî me? Çav û biriyên min çima wek wê bûkê mezin, qerqaş û belek nîn in?

Ez dinêrim qîz û bûkên nav malbata bavê min jî wisa bedew in, kezî û guliyên wan dirêj û çilgulî ne, keziyên min ên vegirtî, ji serî heta binî bîst û pênc in, yên wana çilî zêdetir in, çima yên min ewqas kêm in?

Ez her roj di nav van fikrên nebaş de diçûm û dihatim, heta rojekê meta diya min gazî min kir û got; were qasekê li cem min rûnê, ez ê ji berxa xwe re çîrokekê bêjim.

Got; ev çendek e, ez bala xwe didimê, her roj dema tu ji xewê radibî, berê xwe didî kaniya orta gund û li benda hinekan disekinî, di serî de min got qey tu dixwazî bi avê re bilîzî lê dûra min fêm kir ku av bala te nakişîne, tenê bûka mala birayê min bala te dikişîne û tu ji serê sibê heta êvara dereng li pey bûkê diçî û têyî. Dûra jî tu bi madekî tirş vedigerî malê.

Tu dizanî ew bûka hanê çima ewqas bedew e? Ewqas hêja û jîr e? Dema emrê wê wek emrê te bû, ew jî weke te keçikek biçûk û çilmisî bû, wê jî weke te bi xwe re ser dikir. Dûra ew hêdî hêdî mezin bû, bi ser xwe da hat, bû qîzeke xama û bedewbûna wê her diçû zêde dibû. Ew jî wek te her roj diçû li ser kaniya orta gund, wê ava kaniyê ser çavên xwe dişûşt, her ku dilopek wê ava kaniyê li ser çavên wê diket ew bedewtir dibû.

Çîroka bedewbûna Sefura bûk ev e. Ger tu jî her roj, dema diçî ser kaniyê, bi wê avê ser çavên xwe bişoyî tu yê ji hemû kesan bedewtir bibî. Niha bila ev qewlê min û te be, dema tu çûyî ser kaniyê, kulmek av li ser çavên xwe bireşîne, wê demê tu yê bibînî, wê bedewbûneke çawa bê ser rûyê te. Tenê ev ava hanê jiyanê dide me. Ew çîroka meta diya min ez bedew kirim, wek bedewbûna bûka mala xalê diya min.

# Rastiya kurteçîroka strana Çemê Çetelê

Veysî Varli

**Piştî qetilkirina 14-15 hezar kurdan li geliyê zîlanê û têkbirina serhildana Agiriyê, dewleta Romê weke serhildana Şêx Seîd, ferman û sirgûna serkêş û begên kurdan derdixîne. Li gor stranbêjan, ji van began yek jê jî kesê bi navê Evdo Beg e**

Hefteya borî, di TV'yeke tirkan a beşa kurdî de strana Elî Xwarzê hate weşandin û wekî ku haya wan ji vê dîrokê tune be kê û ji bo çi û çawa ev stran hatiye holê. Li ser vê rewşê min jî xwest ez bi xwendevanên hêja re kurteçîroka stranê binivîsim û ji bo kesên têkildar jî gotin û notayên her du şêweyên stranê pêşkêş bikim.

Piştî qetilkirina 14-15 hezar kurdan li geliyê zîlanê û têkbirina serhildana Agiriyê, dewleta Romê weke serhildana Şêx Seîd, ferman û sirgûna serkêş û begên kurdan derdixîne. Li gor stranbêjan, ji van began yek jê jî kesê bi navê Evdo Beg e. Evdo Beg li hemberî vê fermanê dertê û bi law, pêgirtiyên xwe û xwarzê Elî ve, ji gundê xwe dertên û dibin mehkûm. Ew berê xwe didin stargehên kurdan ango çiyayan.

Dîsa li gor hin dengbêj û çîrokbêjan Evdo Beg hin caran tê gundê xwe maliyên xwe dibîne. Rojek dîsa dema ew, lawê wî û xwarziyê wî Elî tên gund, ji gundiyên wî kesek diçe bargeha cendirmeyan û îxbara Evdo Beg dike. Ji alî cendirmeyan ve dor li mala Evdo Beg tê girtin û jê tê xwestin ku teslîm bibe. Evdo Beg teslîm nabe, ji lawê xwe re dibêje tu bi cendermayen re şer bidomîne, em ê di alî paş de ji malê derkevin. Lawê wî cesaret nake, kesê navmalî jî vê qebûl nake.

Li ser qebûlnekirina her du kesan, Elî yê xwarziyê Evdo Begê dibêje ez ê şer bikim, hûn herin. Elî şer didomîne Evdo Beg û yên pê re diçin, Elî fîşekên wî diqedin û bi birîndarî dîl tê girtin. Bi gelek îşkenceyan wî dibin girtîgeha Bazîdê (hin kes jî dibêjin birine girtîgeha Îdirê ya bi navê Kapusac) bi qasî sê salan bi îşkenceyek giran di girtîgehê de dimîne û li hember hemû îşkenceyan jî cihê xalê xwe nabêje.

Dîsa li gor hin dengbêj û çîrokbêjan, bi alîkariya leşkerekî kurd û li gor hin dengbêjan jî bi rêya malbata xalên xwe agahî dişîne ji xalê xwe re dibêje, "Sirgûna me ya 35 kesan derketiye hepsa Sînop û Zonguldaxê. Ji bon ku me sewqî van bajaran bikin ew ê me bibin bajarê Erziromê, werin bi rê de me xelas bikin."

Rojek Evdo Beg ji bo îxbarkarê ku wan îxbar kiribû fêr bibe û ji aqûbeta Elî agahî bigire, ji bajarê Makûyê tê gundê xwe. Gundiyên Evdo Beg vê agahiya ku Elî şandibû ji Evdo Beg re dibêjin. Li ser vê agahiyê Evdo Beg dikeve nav xebat û planan. Ji dostê bav û kalanê xwe yê bi navê Îbo Beg (hin dengbêj dibêjin Îbo Beg ê Pasînê ye, hin jî dibêjin na ev kesek din e) agahdar dike û ji bona xelaskirina xwarziyê xwe Elî alîkarî daxwaz dike.

Dema ku Elî û 34 mehkûman derdixin dibin Erziromê, Evdo Beg û yên pê re li herêma Kosedaxê û Çemê çetelê (hin çîrokbêj dibêjin Çemê Çetelê di navbera Pasîn û Erdîşê de ye; hin jî dibêjin di navbera Eleşgir û Agiriyê de ye) kemîn datînin. Dema ku leşker û girtiyên vana bi leşkeran re bi saetan şer dikin, yuzbaşiyê ku serokê leşkeran e û tevî bi dehan leşker dikujin û girtiyan xelas dikin.

Elî wekî dubarekirina dîrokê dîsa bi destê îxanetkarê navê wî Feqî ye (ev kes wan îxbar dike) birîndar dibe. Hin dengbêj û çîrokbêj dibêjin Elî li wê derê dimire. Hin jê jî dibêjin Evdo Beg, Elî li pişta xwe dike dixwaze ku bibe Makûyê lê Elî bi rê de dimire.

Piştî vê bûyerê, wekî her strana girînî û şînê, dîsa jina kurd elem, kul û serencama xwe bi girînî bê kes û bê çareyî tîne ziman. Keça hezkiriya Elî ya bi navê Gewezê (hin jî dibêjin Sorgewez) li ser Elî stranê dibêje. Bi demê re stran dibe du şax û yek jê bi devê xalê (Eliyê xwarziya) yek jî bi devê xwarzê (De Xalo -Çemê Çetelê) tê gotin û di çanda kurdan de cihê xwe digire. Piştî vê bûyerê li gor hin dengbêj û çîrokbêjan destgirtiya Elî, Gewez a jan, kul û hesreta xwe bi gotin û girînî kiriye stran û heta roja dimire mêr nake. Evîn xwe û hesreta xwe bi xwe re dibe dispêre axa sar.

## De Xalo

De xalo, de xalo, de xalo, xalo
Çemê Çetelê çemeke sar e, xalo,
Wele xalo Çemê Çetelê çemeke sar e xêlo,
Kelemçê dest efendî xirxanî ye ciwabekê bive ji xalê min î Evdo Beg re,
Belê li Çemê Çetelê, li Deştê Porsînê,
Li weletî xerîban û xurbetê karî xu bike xalo,
Belê bendê Romiya bendeke giran e,
Destê mi di kelemçê da rizîne, hewar e, xêlo,
Ê de hewar e xalo, xalo wez girtî me li xerîbiyê.

De xalo, de xalo, xalo,
Çemê Çetelê çemeka bi genim e, xalo,
Çemê Çetelê çemeka bi genim e,
Kelemçê kesî xêrxwaz nedî ciwabekê bibe ji xalê min î Evdo Beg ra,
Belê li Çemê Çetelê, li Deştê Porsînê, li welatê xerîban û xurbetê xalo karî xu bike, xêlo,
Belê bendê Romiya bendeke giran e,
destê mi di kelemçê da rizîn,
De hewar e xalo, hewar e xêlo,
E hewar e xalo, xalo wez girtî me wey li xerîbiyê.

De xêlo, de xalo, de xalo, xalo
Çemê Çetelê çemeke bi ripin e, xalo,
Kesî xêrxwaziyê ciwabekê ji xalê min ê Evdo Beg ra bibe,
Li Çemê Çetelê, li Deştê Porsînê, li welatê xerîban û xurbetê karî xu bike xalo,
Belê bendê Romiya bendeke giran e,
Destê mi di kelemçê da rizîne,
Hewar e xêlo, xalo wez girtî me...

***Stranbêj: Kawis AXA***

## Eliyê Xwarziya

Eliyê xwarziya xwedê xirav bike Mekê û Medînê ye,
Kafirê Feqî gulekê berî bedena Eliyê xwarziya daye vê sibê, reviye ketiye ber teldê mîrata bexîrê ye, nakeve berava eyneliyê ye.
Eliyo bira çevê xalê te kor bibin, vê sibê tilî peçiyê xalê te nagirin, merhemekê çêke bide ser devê mîrata birînê.
De rabe, rabe, rabe Eliyo rabe,
De rabe bira serê xalê qurban be.


Eliyê xwarziya, felekê çima li me wiha kir,
Kafirê Feqî vê sibê gulekê berî bedena Eliyê xwarziya daye, reviyaye ketiye ber teldê bexîrê,
Dilê onbaşî, bînbaşî, kafirê Roma Reş, me şa kir,
Bira mala Feqî kavil bibe vê êvarê,
Mêraniya xalê te kir kesî nekir,
Çewa mêraniya xalê te nava êl eşîra da hinda kir.

De rabe, rabe, rabe Eliyo rabe,
Bira serê xalê qurban be.

Lo xalo, lo xalo, lo xalo
Vê sibê dilê min kînekîn e,
Wey lo xalo vê sibê dilê min kînekîn e,
Gula kafirê Feqiyê Botî çiqa birîna xwarzê te dêşîne,
Gula kafirê Feqî çiqa birîna xwarzê te dêşîne
Xalo de tu rabe, bike bilezîne,
Cinyazê Eliyê xwarziyê va orta helîne,
De Roma Reş xayîn e, wê te bigere, destê zorê, cinyazê Eliyê xwarziya te bistîne, xalo rabe,

De rabe, rabe, rabe,rabe, rabe,
Serê xwarzê bira qurban be.

***Stranbêj: Bêmalê KEKO***



# Arşîva kurdî desteser kirin

Arşîva dewlmend a beşa kurdî ya televîzyona Kerkûkê ku ji aliyê rojnameger Haşim Cebar ve hatibû parastin ji aliyê Tora Ragihandina Nûçeyan a Iraqê ve hat desteserkirin û birin Bexdayê.

Haşim Cebar ê rojnameger û pêşkêşvan e, 32 salan di televîzyona Kerkûkê beşa kurdî de kar kiriye. Di van 32 salan de hemû berhemên kurdî yên hatin weşandin, li gel xwe arşîv kirine. Cebar ji sala 1986'an ve li televîzyonê kar kiriye û piştî rûxîna rejîma Baasê jî arşîva beşa kurdî li gel xwe parastiye. Her çiqas gelek caran ji bo parastinê li deriyê gelek kesan û bi taybetî daxwaz ji berpirsên hikûmeta herêmê re kiriye ku arşîvê jê bigirin û weke arşîvek neteweyî biparêzin lê tu kes bersiva daxwaza wî nedaye.

Haşîm Cebar li gel xwe hezar û 950 stranên ku piraniya wan kurdî ne, 117 drama, fîlm û rêzefîlmên kurdî yên reş û spî û 14 dramayên kurdî yên bireng parastine. Haşîm Cebar dibêje ku arşîveke ji bo medyaya kurdî xezîneyeke dewlemend bû lê mixabin ev berhem ji aliyê Tora Ragihandina Nûçeyan a Iraqê ve hatin desteserkirin.

Piştî desteserkirina arşîvê, ji aliyê rewşenbîr û aktîvîstan ve kampanyaya parastinê hatibû destpêkirin lê ev kampanya jî bêencam mabû. ***HEWLÊR***

# Bernameya Festîvala Derhênerên Jin aşkera bû

Pêşbaziya Festîvala Derhênerên Jin a Navneteweyî ya 4'emîn û bijareya pêşandanê hat aşkerakirin. Festîval îsal ji ber pandemiyê dê bi awayê dîjîtal û li Îzmîrê li hin cihên ji bo gel vekirî di navbera 1-7'ê adarê de bê lidarxistin.

Temaya festîvala îsal "Lehengiya Super" e û drûşma wê jî "Em hilnayên" e.

80 fîlman serî li festîvalê da. Berhemên tev li festîvalê bibin û bên nîşandan, ji aliyê jûriya pêşî ya derhênera belgefîlman Berna Gençalp, derhênersenarîst Dîlek Çolak û nivîskarê sînemayê Duygu Kocabaylioglu Arazli pêk tê, hatin nirxandin.

Di heşt kategoriyan de, 45 fîlm ji bo festîvalê hatin hilbijartin. Ji van 45 fîlman 12 fîlm wê cara yekê hem li Tirkiyeyê hem jî li dinyayê di Festîvala Jinên Derhêner a Navneteweyî ya 4'emîn bên nîşandin. 31 ji wan jî wê cara yeke li Îzmîrê bên nîşandan.

Her wiha di çarçoveya festîvalê de îsal wê cara yekê di kategoriya metraja dirêj de pêşbazî hatin kirin. Berhemên Rûken Tekeş 'Aether', 'Amina' ya Kivilcim Akay, 'Bilmemek' a Leyla Yilmaz, 'Kader Postasi' ya Elîf Akarsu û Çigdem Bozanli, 'Ovacik' a Selenga Taşkent di Pêşbaziya Metraja Dirêj a Makaraya Zêrîn de li fînalê man. Di festîvalê de, îsal cara yekê kategoriya cerebeyê jî cih digire. ***ÎZMÎR***




# Li ser pirsgirêkên sînemayê kurtefîlm çêkirin

Hunermendên Germiyanê li ser pirsgirikên sînemayê yên bajarên wek Germiyan û Xaneqînê bi navê 'Roja Heftem' kurtefîlmek çêkirin.

Derhêneriya kurtefîlmê bi navê 'Roja Heftem' hunermend Bîlal Selah kiriye û serpereştiya wê jî hunermend Serbest Ehmed û Ebas Erkawazî kirine.

Kurtefîlmê ku li bajarê Xaneqînê hatiye çêkirin, hê di pêvajoya montajê de ye. Her wiha kesên ku di vê kurtefîlmê de cih girtine bi devoka Xaneqînî (Kelhorî) diaxivin.

Bîlal Selah der barê kurtefîlmê de wiha axivî: "Kurtefîlm hem qala nebûna hola sînameyê ya li Germiyanê dike, hem jî li ser pirsgirêka sînameyê ya Germiyanê disekine. Em ê di roja cîhanê ya sînemayê de bidin pêşandin. Çîroka vê kurtefîlmê nebûna cih û fikirandina takekesî û çanda civakî ye. Kurtefîlm di naveroka xwe de peyamek rexneyî dihewîne. Ev peyam ji bo kesên ku sînemayê wek qada bazirganiyê dibînin hatiye dayîn. Li vî welatê, em dikarin çand û hunera xwe bi pêş bixin lê em hêj nikarin holeke sînemayê ava bikin." ***GERMIYAN***



xwebûn

1-7 Sibat 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 59

***İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:*** Kadri Esen
***Sorumlu Yazıişleri Müdürü:*** İdris Gürmez
***Yayın Danışma Kurulu:*** Abdulla Peşêw, Ehmed Huseynî, Kakşar Oremar, Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev, Selîm Temo, Dr. Zerdeşt Haco
***Yayın Türü:*** Haftalık Yaygın Süreli
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 ***Yenişehir / Diyarbakır***
***Baskı:*** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı ***Bağlar / Diyarbakır***

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*

**Ji bo abonetiyê**
Tel:0 (541) 806 84 85

# Bi nêrîna vegan 'bîra jibîrkirî' çi ye?

Gulan Morî

## Endustriya şîr, çêlekan di cihên teng de digire, di bin navê dolandina çêkirî (tovdan) de çend caran tecawizê wan dike. Golikên mê weke makên xwe bi heman rûdanê re rû bi rû dimînin û yên nêr ji bo goştê wan tên xwedîkirin

Hûn qet rastî reklamên şîr hatine? Çêlekên bextewar li deştên kipîkesk diçêrin. Heta li ber stranan direqisin. Zarokên bextewar bi golikan re dilîzin û çêlek şîrê xwe bi wan re parve dikin. Çêlek, şîrê ku jixwe bo zarokan çêkiriye pêşkêşî wan dike. Em dibînin ku bi noşî berhemên ji şîrê wan dixwin-vedixwin. Çiqas dîmenekî bextewar e ne wisa? Her kî li van reklaman temaşe bike wê wiha bifikire ku çêlek bextewar in û şîrê xwe tim ji bo mirovan digihînin. Di ser de jî ji bo dereweke wiha zarokan jî bi kar tînin, lê di rastiya xwe de ev kabûs e!

Endustriya şîr, çêlekan di cihên teng de digire, di bin navê dolandina çêkirî (tovdan) de çend caran tecawizê wan dike. Golikên mê weke makên xwe bi heman rûdanê re rû bi rû dimînin û yên nêr ji bo goştê wan tên xwedîkirin. Şîrê çêlekê ji bo ku golikên xwe bimêjînin heye lê ji bo ku şîrê çêlekan bê ser sifra mirovan guhanên wan bi makîneyên dotinê ve tên girêdan. Kes naxwaze em vê rastiya acizker bibînin. Kes naxwaze tiştên ku li mezbexane diqewimin em bibînin. Wexta ku zarokek reklamên goşt an jî sosîsê dibînin qet fêm nakin ku ew parçeyên canberekê ne. Yên hinekî li ser disekinin an jî dibêjin em tiştekî nojdar bixwin, ji bo ku bazarên xwe firehtir bikin derewên weke "hêkên mirîşkên gerok" an jî "goştê berxên ku li çewligê mezin bûne" û hwd. pê ve dikin. Li wir tirê qey wexta ku wisa bê kirin, wê wijdana mirovan rihet bibe, serjêkirina heywanan piştî bi bextewarî bijîn pêk bê wê normal bibe.

### Bîra jibîrkirî (Absent referent)

Em wisa tevdigerin ku wexta rewş bi vî rengî be, pêxwarinên tên ser sifra me weke şîr, penêr, mast, sosîs, salam qelî û hwd. koka wan nagihîje heywanan. Berhemên ku ji heywanan hatine bidestxistin bi navên nû derdikevin pêşberî me; weke hêt, sicûq, pîl, goştê piştê... di ser de jî van parçeyan tevî pêxwarinên cuda dikin û nayên naskirin. Pê re em wisa tevdigerin ew pêxwarinên bi navên nû, ne parçeyek ji heywanan in. Ev binavkirin, bi me didin bawerkirin ku em tiştekî nû dixwin. Li vê derê têgeha "bîra jibîrkirî" (absent referent) derdikeve pêşiya me û wê rewşê baş dide fêmkirin. Carol Adams, bi vê têgehê destnîşan dike ku di feraseta mirovan de têkiliya rewşa goşt a nû û zindîbûna wê ya ji berê re qut dibe. Li gel ku mirov dizanin eslê tiştên ku ew dimezixînin û ji bîr dikin ev e; xwarina tê pêş wan a wan heywanan e ku demeke pêş hatine tunekirin, xwîna wan hatiye rijandin û ji ber vê yekê êş kişandine. Em dikarin vê rewşê weke beşên bîra winda jî şîrove bikin.

Ez pê bawer im wexta ku kêrê bidin destê mirovan û jê bixwazin heywanekê ser jê bike, piraniya wan wê nikaribin vî karî bikin. Ji ber ku lênerîna çavên heywanan, dîtina rijandina xwînê û perpitîna wan li aliyekî, di fîlmekê de temaşe bikin jî piraniya mirovan wê aciz bibin. Mirovan di zaroktiya xwe de çêlek xwedî kirine, bi mîh, berx û mirîşkan re têkiliyeke hestewar danîne. Dibe ku we bihîstibe mirovin hene goştê heywanan ku wan xwedî kirine hatine serjêkirin nexwarine. Baş e ser çavan di rewşa asayî de mirovên goştxwer çima ku kêrê didî destê wan serê heywanan jê nake yan jî goştê heywanê ku xwe xwedî kiriye naxwe? Va ye 'bîra jibîrkirî' tev van nakokiyan rave dike.

Pir zehmet e dema mirov heywaneke canber a ku mirov pê re têkiliyeke hestewar datîne tunebûyî bihesibîne, lê niha em werin ser mijara heywaneke ku me rû û rûçikê wê nedîtiye. Em hema ji bîr dikin ku goştê di nav teyfîka me de ye demek berê canber bû. Ev rewş di esasê xwe de korbûna îdraq û hayjêbûna me ye. Carol Adams dibêje, "Lisernerawestina 'bîra jibîrkirî'vê yekê îfade dike ku em raboriya berhemên têne ser sifra me nizanin û xwediyê bîreke sivik in. Rastî ev e ku her tiştê em destê xwe didinê nîşana wê êşê ye ku kesekî din dikişîne. Bîra jibîrkirî hem dike ku em ji bîr bikin heywan weke heyîneke xweser in hem jî derfet dide ku em ji bo hewldanên ji bo heywan li ber çav bin tên kirin li ber xwe bikin. " Yanî em nizanin ku bi xwarinên xwe em rê didine kîjan encaman. Ev yek ji korbûnê ne cudatir e.

### Heywan kirine meta

Darwîn wiha dibêje: "Di navbera hişê mirov û heywanan de cudahî çiqas zêde be, ev cudahî cudahiyeke çendanî ye; ne çawanî ye." Darwîn li ser hevşibandina hestiyarî ya mirov û heywanan pirtûkeke qerase nivîsiye, em vê yekê bidin ber çavên xwe em nikarin vê rastiyê bavêjin pişt guhên xwe. Em dikarin bêjin encama vê destnîşana wî têr û tije ye. Lêbelê ev cudahî her çiqas çendanî be jî aliyê mirovan ê pozîtîvîst ku mirovan ji bîra wan a hestewar diqetîne, heta ku xwe weke kirde bibîne, canberên ji derveyî xwe jî weke heyber (tişt), ji ber ku wan weke 'dan û nanê' ji bo pêdiviyên mirovan dibîne, ji bo lêkolînan heywan jî ji qada xwe ya xwezayî tên qetandin û vediguherin 'metayan'.


Hawireke zanistê heye, ji heywanên ji bo xebatên zanistî tên qurbankirin bigirin heta qaşo bi navê fêmkirina heywanan wan terkî nav hepsa cerebeyê dike. Şibandina hestewar a di navbera mirov û heywanan de bidin aliyekî mirov ji rastiyê dûr ketine û kor bûne ku nafikirin hestên heywanan hene û canê wan wê biêşe. Ji ber vê yekê hawira zanistê ji feraseta ku "heywan" tenê amureke cerebeyê ne gavek wêdetir derbas nebûye. Hawira zanistê ji hêla bikaranîna heywanan ve xwediyê dîrokeke şermê ye.

Her çiqas, li hin welatan cerebeyên li ser heywanan qedexe bin jî gelek welatan qedexeyên zelal nîn in û bedena heywanan tê bikaranîn. Bîra jibîrkirî tenê çend teyfikên ji berhemên heywanan pêk tên nîn e. Pasteyeke mezin e û çerxa sermayeya kapîtalîzmê pê dizivire.

Yanî hûn wexta ku biçin wargeha heywanan dikarin wek aktîvîteyeke perwerdeyî pêk tînin bifikirin; lê beşên bîra we yên winda wê bizanibin heywanên ku li wê wargeha tê de dijîn bi zorê hatine hepiskirin, ji wargehên xwe yên xwezayî hatine qetandin û di ser de jî ji ber vê yekê ruhê wan parçe bûye. Lêbelê nedîtina vê rastiyê û reftara weke nehatiye dîtin û jibîrkirin wê zêdetir cazip were.

### Heywan ji mirovan ne kêmtir in

Lêkolînên hewyannasiyê jî ji ber feraseta heywanan weke metayan dibîne ji nêzikaya navendparêziya mirovî derbas nabe. Werner Heisenberg dibêje, "Ya ku me çavdêrî kiriye xwezaya bi serê xwe nîn e, xwezaya ku ji serada metoda lêpirsîna me re derbasbûyî ye." Di vê rexneya xwe de dibêje, mirov heywanan ji hawira xwe ya xwezayî diqetînin û li feraseta navendparêziya mirovî tên hepiskirin. Her wiha hewyanên ku rastî pêşdarazî û pozbilindiya me tên û em dîsa hewl didin ku bi fêmkirina xwe ya şaş wan muqayese û şîrove bikin. Frans De Waal jî wiha dibêje: "Di jiyana sihorîkan de cihê jimartinê tune, her wiha em pirsa "jimartinê dikarî yan nikarî" ji sihorîkan bipirsin ev bêedaletî ye." Bi rastî jî em heywanan wiha rave dikin ku bi qasî me hişê wan naxebite, mîna me tevnagerin. Hejmartina jimareyan ji bo sihorîkan tiştekî îfade nake. Mînak piraniya me nizanin ku me duh çi xwariye. Lê sihorîk çend sal jî derbas bin cihê ku findiq lê veşartine ji bîr nakin. Eylo ji me baştir dibînin, piraniya heywanan ji me baştir bêhnê digirin. Mirov dikare mînakan zêde bike lê bi kurtasî her heywan li gorî bi kêrî xwe tê xwedî qabiliyetan e. Ev rewş heywanan ji mirovan kêmtir nake. Hawira zanistê hê jî bi van rastiyan re rû bi rû nemaye. Em dikarin rûbirûnemayînê bi 'bîra jibîrkirî' ve rave bikin. Çimkî berê navendparêziya mirovî esas li ser vê rastiyê ye: ji bilî me hemû canber ji hestan dûr in. Ev feraset, her canber çiqas pragmatîk in an na re eleqeder dibe, çi 'tişt'ê (ji ber ku êdî bûye tişt) pê re eleqeder dibe naxwaze bîra wî, hestên wî bizanibe. Her wiha di navbera qada xwe ya konforê yan wijdanê de tercîhekê dike. Qurbankirina wijdanê ji bo konforê! Her hal ji vê girantir rexnedayîna mirovahiyê nedibû!



Mirovê li ser mijokdariya heywanan ku esasa wê digihîje cihêkariya 'ez û yê din' xwe kiriye kirde, qadên mijokdariyê pêk tîne û 'yên din' ên pirengîn diafirîne. Dibe ku yên herî zêde tên biçûkxistin, beden û hişê wan tê hîçkirin jin bin. Mêrtiya ku 'bûye serwerê xwezayê', hewl dide jinan jî têk bibe. Li vir di navbera nêzikatiya li hember jinan û xwezayê de şibînek heye. Çawa ku di hembêza xwezayê de her parçeyekî heywanan hatiye cazîpkirin, piştî bênasnamekirinê pêşkêşî xizmeta mirovan hatibe kirin, her wisa jî bedena jinan hatiye bênasnamekirin û ji bo zewqa nêrtiyê tê qurbanîkirin. Carol J. Adams vê rewşê weke 'pêkutiyên girêdayî hev' şîrove dike û zayenperestî, rêgezperestî û şêweperestî çawa bi hev re girêdayî ne nîşan dide. Tevgera ekofemînîzm wiha difikire ku nijadperestî, zayendperestî, çînparêzî, heteronormatîfî û cihêkariya astengdariyê şêwepe-restiyê re riya wan dibe yek.

Ekofemînîstên wek Carol Adams, Greta Gaard, Lorî Gruen û Pattrice Jones wiha difikirin: pêkutî rê dide stratejiyên xwe dispêrin hevkariyê.

Di dawiya vê feraseta giştî de heman serwêriya naşibe me ye ku bi hişê nêrza dixwaze hem bibe serdestê xwezayê û hem jî xwediyê jinan. Li ser vê esasê, femînîzm û veganîzm nêzî hev dibin. Ji ber vê yekê Virginia Woolf dibêje: "Dema ku goşt bê jibîrkirin ew dem dema lêhûrbûna me ya li ser jinan e. Yanî riyên ku derdikevin heman sûkê bi çareseriyên hevpar ve pêkan e."

Mark Hawthorne wiha dibêje: "Hem laşên mirovan hem jî laşên heywanan weke 'tişt', weke 'parçeyek goştê xwarinê' tê heyberkirin." Yanî hişê nêrza yê weke 'yê din' li heywanan dinêre û weke amûra xwarin-vexwarinê dibîne, jinên ku weke wan mirov in, kirine 'yên din' û her organeke wan ji bo hez û razên xwe kiriye qurbanî. Çi ku Carol Adams dibêje, 'termînolojiya xwarina goşt pêşdaraziya nêrza nîşan dide' mafdar e. Çawa ku heywan hatine parçekirin, ji wateya xwe ya ontolojîk hatine dûrxistin, bi heman awayî jin jî bi pêşdaraziyên nêrza weke beden û ruh hatine parçekirin û ji wateya xwe ya ontolojîk hatine dûrxistin.

Carol Adams di pirtûka xwe ya "polîtîkaya zayendî ya goşt" de wiha dibêje: "Wexta ku ji mêran fanteziyên wan ên zayendî tên pirsîn, hejmareke pir mêr, ' parçeyên bêteşe ên laş; pêsîr, ran, vajîna, qûn û hwd. weke dîmenên pornografîk tên vegotin". Yanî 'pozbilindiya nêrza' di navbera jinan û xwezayê de serdestiyeke paralel pêk tîne. Di eslê xwe de ev serdestî jinan pasîfîze dike, 'hişê mêrên goştxwar û bihêz' dibe kirde. Şîroveya goştxwarinê ya Simone de Beauvoir weke "pozbilindiya goştwar" Mary Daly 'pirxwariya jinkuj' û Kate Millet jî weke "mirovxwariya zayendî" bi nêrîna jinan divê çendîn caran bê nirxandin. Çimkî jinên ku ji goşt hez dikin bindestiya li ser xwe qebûl nakin, ji ber ku çavên wan li serdestiya li ser cureyên din re girtî ye, ji aliyekê ve hişekî bûye mêr dihewînin.

C. Adams nebatan weke sembola pasîfiya jinanî dibîne. Di dîrokê de rola jinan bi şoreşa cotkariyê bûye biber û hilberîner. Jinan tov malî kiriye, canber pîroz dîtine û pê re bûne kirdeyên hişekî bi vî rengî. Ji ber vê yekê jî tevgera jinan a weke 'radîkal a romantîk' nêzîktirî nexwarina laşê heywanan e.

## Nêrîna femînîst û veganîzm

Di salên 1970'yan de dirûşmeyeke femînst hebû; "Tiştên şexsî polîtîk in." ( Gotineke bi nav û deng a Kate Milletê) Di esasê xwe de Mîllet bi vê gotina xwe dixwaze vê destnîşan bike; mirov bi terz û teşeya xwe, bi helwesta xwe, bi nêzîkatiya xwe ya canberan re û hwd. weke helwesteke polîtîk wê bi xwe re guherîneke mezin bîne. Ev rewş nîşan dide ku divê pîvanên me yên razîbûn û nerazîbûnê û pê re di bingeha xwe de polîtîka ji kesayeta me dûr neyên nirxandin. Ji ber vê rastiyê em digihîjine vê encamê ku em çi li xwe dikin, li ku derê dijîn, çawa dibin civakî, heta em çi dixwin her tişt polîtîk e. Yanî mirov wexta diguhere, tercîhên xwe pêk tîne, esas bi tercîhên xwe dibe parçeyekî guherîna civakî. Em bi vê nêrînê lê binêrin, di eslê xwe de ecibandina veganîzmê bi qasî ku takekesî ye, tevgereke polîtîk e jî, ku mirov heywanan weke amûreke mijokdariyê nebîne û li gorî vê yekê helwesteke exlaqekî û polîtîk bi pêş bixe.